CIGERXWİN

# ŞEFAQ

DİWANA 6'A

STOKHOLM 1982

CIGERXWİN

# ŞEFAQ

DİWANA 6'A

Weşanên Roja Nu : 4

Navnîşan:

BOX 4038

141 04 Huddinge/Sweden


ISBN 91 7672 004 7

Bokförlaget Roja Nu

Copyrigt Cigerxwîn

Printed in Sweden

Stockholm 1982



CIGERXWÎN

# FEHRESTE

Hetta Kengî Di Xewda Bî ? .................... 15
Fidakarê Welatim .......................... 17
Port û Şîret .............................. 18
Keko Ez Bilûrvanim ........................ 25
Bargiranim ................................ 28
Fort û Port ............................... 30
Birca Gernasan ............................ 31
Azadîxwazim ............................... 35
Dayê Tu Megrî ............................. 38
Li Rojhilat ............................... 41
Feratim Kêferatim ......................... 43
Di Bîr Anîn ............................... 46
Keko Ziman Dirêjim ........................ 48
Dilber Gelek Ciwane ....................... 51
Leyla Şehîd ............................... 59
Welatê Çirto û Virto ...................... 63
Zira Kerê Lota Devê ....................... 67
Por Spî Bûye Gilok ........................ 77
Ey Felek .................................. 80

BIRÊ CIVAKÎ

Jîn û Hebûn ............................... 83
Serxweşim ................................. 84
Sofiyê Meyxane me ......................... 85

Ez û Gundê Hesarê .......................... 88
Nezanî Bargiranî .......................... 95
Jin Hene Jinkok Hene .......................... 98
Mela Yûsifê Hesarî .......................... 113
Dilgirtina Kora .......................... 118
Cizîrî Rabe Meyzêne .......................... 121
Ka Kevn Nadêrin .......................... 123
Rebenname .......................... 124
Dînname .......................... 131

BIRÊ EVÎNDARÎ

Ahî ji Destê Dûriyê .......................... 139
Gulî Şengê .......................... 141
Ez û Yar .......................... 143
Pesnê Şoxekê .......................... 146
Xwe Derxe .......................... 151
Mirovim Ez Ne Hovim .......................... 153
Serwe-Bejnê .......................... 155
Ez Girtî û Dîlim .......................... 157
Sermestê Evînim .......................... 159
Agir û Sohtin .......................... 168
Ka Dosta Zana .......................... 170
Perçekirina Risteke Cizîrî .......................... 172
Qîr û Hewar .......................... 175

# CEGERXWÎN - DENGBÊJÊ RASTIYÊ Û AZAYÊ

CASIMÊ CELÎL

Navê Cegerxwîn, navê hostê xebera, xudanê lewzê şîrin li herçarterefê Kurdistanê, ji rohilatê girtî hetanî roavaê, ji şimalê hetanî canûbê nava xwendevanê kurdada xweş eyane. Şiêrêd wî bûne stran û nava cimetê digerin. Xort û qîzê kurdaye nû bişkivî nivîsarê şayîr bi devkî hîn dikin, bîr û bawarîya xwe, miletperwarîya xwe bi wan şiêra tam dikin û bi xwe jî dibin ceger bi xwîn. Tune civînek yan jî êvarîk, li ku şiêrêd hilbestvanê kurdayî nav û deng neêne xwendinê.

Navê Cegerxwîn nava kurdê Sovêtêda jî eyane.

Îro welatê Sovêtêda- welat, kîderê zixtî û zordestî, newekehevbûn û koledarî ji binyatê hatîye rûxandinê, kîderê bi seda cimet azayî û serbestîya xwe destanîne, pareke cimeta kurda tevî wan cimetêd bira çanda xweye miletîyê pêşda dibe, bi tarîq û lîtêratûra xweye kevnar dibe nas û bi hizkirin, navê Cegerxwîn diwekilîne wîva kubar dibe.

Zarokê kurd li Ermenîstanê, mektebvanê koma çara gava pertûka xweye dersê-"Zimanê kurdî" vedikin, şiêra Cegerxwîn "Xwendin" dixwînin. Ewana dengê hilbestvanê şorişvan dibêhên, dengê nalîna dilê wî-bona halê welêt, gazîya wî, ku xort û qîz baş bixûnin, çimkî :

*"Xwendin nebî kes naçe pêş*
*Peyda dibin pir derd û êş*
*Her dem di bin destê neyar*
*Em dê bikin xukî û bêş"*

Sal bi sal mektebvanê kurdê sovêtê diha nêzîk û hûrgilî nasîya xwe didine emirjîîn û bîr-bawarîya hilbestvanê hizkirî. Ewana li dersxana v-vı - da nava pertûka dersêye "Lîtêratûra"-êda ser Cegerxwîn dixûnin, ku "Zarotî û xortanîya Cegerxwîn halekî giranda derbazbûye. Ji çûktîyê xwe gelekî bi xwendinê girtîye, lê ewî nikarbûye xwastina xwe mîaser bike, çimkî bona wê yekê mecal lazim bûne".

Şagirt ji wê pertûkê derheqa wê revê û çetinayê pê dihesin, kîjan hilbestvan xortanîya xweda dîtîye. Ewana dixûnin, ku tevî wê hesîrîyê, êş û lêdanê rika şerkarîyê, miletperwarîya kûr dilê şayîrda sist nebûne, agirê gumanê bona azayê hela diha gurbûye û lema jî Şêxmûsê ji gundê Hesarê bûye dengbêjekî ceger bi xwîn. Li pirtûka dersxana v-vı- da ewana dixûnin: "Cegerxwîn çawa şayîr,çawa şerkarê miqabilî împêrîalîzmê, kolonîalîzmê û zordestîyê timê ji alîyê cimete kurdada hatîye hizkirinê. Ew tucara ji dijmina netirsîaye, tucara ji şerkarîya cimetêye giran xwe şûnda negirtîye".

Du şiêrêd Cegerxwîne eyan: "Kurdistanim Ka" û "Pembiwê meye, lê em tezîne" li nava wê pertûka

dersêdanin. Halê miletê kurde bindest û zêrandî nava van herdu şiêrada bi firekî vedibe. Mektebvanê Sovêtêye kurd, ku welatê xweda bindestî û zêrandin nedîtîne, îdî rind zanin ku kurd û Kurdistan bin nîrê neheqîyêda zara-zarin,bin destî dewletêd kolonîalîstda tîş-tîşîne, pîre-pîre, û lema Cegerxwîn dike gazî, dike hewar :

*"Bax û bostanim ka ?*

*Ax, gulistanim ka ?*

*Dijmin tev girtin ax !*

*Ax, Kurdistanim ka ?"*

Serpêhatîya Cegerxwîn -ew serpêhatîya miletê meye: kesîbî, zulm û zorî, hebs û lêdan, werguhêzî û mihacirî. Lê tevî van gişka-serbilindî û kubarî, mêrxasî û egîtî, hîvîya bêşik-bi şerkarî bigihîje armanca xwe. Bîr û bawarîya nivîsarêd Cegerxwîn ew bîr û bawarîya miletê meye. Ay lama jî ewana ewqas ji alîyê cimetê hizkirîne û milet wana diparêze.

Mezinaya Cegerxwîn, çawa rewşanbîr-merivekî xudanê bîr û bawarîya pêş, nek tenê li wê yekêdane, gelo ew çawa halê miletê xwe dikewgire, bona miletê xwe dike hewar û gazî. Mezinaya her fikirdarekî, usa jî mezinaya Cegerxwîn nava wê yekêdane, wekî ewana ji qalibê miletîyê dertên û bi fikirdarîya xweva dibine hûmanîstêd mezin, dengbêjêd hemû miletêd bindest û zêrandî, li kîjan qulbê din-

yaêda jî ewana bivin.

Cegerxwîn bi şiêrêd xweva piştovanê heqîyêye, piştovanê azayê û merivhizîyê. Ew nikare dengê xwe bilind neke, neke gazî bona wan efata,wan wetenhiza, yêd ku rabûne şerkarîyê li Afrîqaê, Asîayê, Amêrîka Latînîyêda, bona wan mileta yêd ku mîna miletê kurda bin nîrê neheqîyêda têne zêrandinê. Bona înternasîonalîzm û merivhizîya Cegerxwîn miletêd dinyaê wê nivîsarêd şayîr bixûnîn,hij wana bixin û bivin piştovanê şerkarîya miletê kurda.

Dewlemende ziman û dîdemêd bedewatîyêye nivîsarêd şayîr. Nava wanda bi awazêd reng-rengî fikirdarîya miletîyêye pirqurne dîhar dike. Tune şîêr, kîjanî em bixûnin û meseleke cimetê, aqilbendîke kal-bava têda nevînin. Kanîya zimanê Cegerxwîn-zimanê miletê meye, çevkanî, ku şêlû nebûye, ava wî zelale û dilê kesirî hêsa dike.

Nivîsarê şayîr bona zanîyara û kurdnasa wê bivin esasê çendik çend lêkolandinê ulmî.Xebata ulmîye pêşin ser "Poêzîya Cegerxwîne bajarvanîyê"sala 1966-a li Yêrêvanê ji alîyê înstîtûta rohilatnasîyê ya Akadêmîya Ulmaye Ermenîstanê hatîye çap kirinê. Xudanê vê lêkolandinê Ordîxanê Celîl pertûka xweda usa jî çil û du şîêrêd şayîre hilbijare neşir kirîye. Herdu cildêd Cegerxwîne pêşin îdî zûva dest nediketin. Bona ku şiêrêd van herdu

dîwana bikevin destê xwendevanê sovêtîyê, Ordîxanê Celîl ew şiêr welgerandîye ser tîpê rûsî. Îro ewana bûne milkê xwendevanê kurdê sovêtîyê.

Salekê şûnda hilbestvanê meyî hirkizî wê bive heyştê salî. Bona emrekî heyştê sal ne kême û ne pire. Ne kême, çimkî tebyeta "bêîsaf" bixwazî-nexwazî ya xwe dike, ji sehet qewat û taqata benda kêm dike. Ne pire, çimkî Cegerxwîn- şayîr hê cahile (gence). Gava şiêrêd wîye nû nivîsî dixûnî,dil kutana wîye alavî û hur, dibêhêyî. Ewî hê gence, çimkî efrandinêd wîda em dengê tofanê dibêhên,nerehetîya ruhê wî bona bext û yazî, armanca milet. Bêtaqetî, ofîn û axîna kaltîyê ne pêşê şayîrê meyî hizkirîye.

Ez bawarin, ku şayîr hê sale salêd direj wê me bi nivîsarêd xweye giranbahava şake.

Ez li pîrozbayî bimbarekîyê didime şayîr bona çap bûna dîwana wîye VI-a û gumanim, ku ev dîwan jî mîna dîwanêd Cegerxwîne pêşin ji alîyê xwendevana bi hizkirin bê qebûlkirinê.

Ez ji hevalê "Roja Nu" ra divêjim serfinyaz bin, rûspî bin, ku we xizmeta çap kirina dîwanêd şayîrê meyî nav û deng hildaye ser milê xwe, çimkî bi wê yekêva hûn alîkarîya mezin didin pêşdaçûyîna lîtêratûra cimeta me.

10.2.1982 Yêrêvan - Ji nexweşxanê

# BIRÊ WELATPERWERİ

## HETTA KENGÎ DI XEWDA BÎ ?

Bese millet li te şerme
Hetta kengî di xewda bî !?
Di bin destên neyarande
Hejar û dîl û kola bî ?
Bihar va tê çiya xweş bûn
Weke şêran herin şer em
Çima wer jar û xemgîn bî
Hetta kengî tu ranabî !?
Binêrin win li Engola
Wekû şêran ketin çola
Serê te hişk wekî pola
Di bin destê neyara bî ?
Serî hildî, tu gernasî
Eger rabî tu mêrxasî
Gelo raste divê bimrî ?
Di nav dijminde winda bî ?
Ji dijminre dibî rencber
Bi paşde mayî bê rêber
Ji bo dijmin dibî şevger
Bese îdî weha nabî !?

Were carek ji xew rabe !
Weke gernas û şêra be !
Xwe pêkbêne bi hevra be !
Divêm hişyar û zana bî
Bese win rê bidin zana
Bidin pêzan û hozana
Ji bo çi wer li pey şopa
Beg û şeyxa û axa bî ?
Çi ol û êl û malbatin
Evên dî qey hemî tatin !?
Hemî yek dar û yek katin
Bibin yek da, ku dil şabî
Bi: tang û top û lek millet
Tu gavan pşde bavêje !
Hetta kengî li benda van
Nivîştê: şeyx û seyda bî !?
Tu guh med van beg û axa
Xwe rapêçê li ser şaxa
Ji dijmin bigre va baxa
Tu dê serdar û paşa bî !
Cigerxwînim dixwazim ko
Ji bo te rast bibêjim ez
Tu guhdêre li dengê min
Neko saza li ber ga bî ?

## FIDAKARÊ WELATIM

Ere daye metirse vame hatim :
Wekî rojim niha vame hilatim !

Ji bo ko te ji dest dijmin derênim
Wekî Zab û Feratim, kêfratim

Dixwazim derkevim şax û zinaran
Li ber dijmin wekî lat û kelatim

Ji min dijmin ditirsî, pir dipirsî
Ku ez hatim wekî Zab û Feratim

Didim ber xwe hemî sermayedaran
Wekî Şapim di Sîpanê Xelatim

Ji dostanre hemî pertav û ronak
Ji dijminre wekî arim, şewatim

Ji bo jar û belengazan biharim
Ji bo har û neyaran ez şibatim

Li tarîxê binêrin ez kusame ?
Xwedî eywan û birc û pût û latim

Evim ez, lê di bin destê neyarim
Eger rokê ji xew rabim du qatim

Li ber pozê neyaran xurtemêrim
Ciger-xwînim, fidakarê welatim.

## PORT Û ŞÎRET

Hela were, hela were !
Ji bo te bêjim eşkere

Em bûn çera hirç û gura
Bûn alifê ga û kera

Hela were, hela were !
Ji bo te bêjim eşkere.

Heval bibin tev Markisî
Bawer mebin bi hîç kesî

Bi pêşde gernas û şiyar
Êrîş bikin sênca neyar

Hela were, hela were !
Ji bo te bêjim eşkere

Win kom bikin zêr û pera
Zû çêbikin serleşkera

Hela were hela were !
Ji bo te bêjim eşkere

Kurd perçe-perçe çend kerî
Doza xwe nabin ta serî

Kole di bin destê neyar
Çawa bibim jê hêvîdar ?

Hela were, hela were !
Ji bo te bêjim eşkere

Divêm şiyarbin hey heval !
Bidin di vê rê can û mal

Li ser çiyan şepal û şêr
Êrîş bikin li jor û jêr

Hela were, hela were !
Ji bo te bêjim eşkere

Eger wesan çend perçebin,
Dê tim di bin zorêdebin

Ger em nebin yek perçe ar
Guh nadî dengê min neyar

Hela were,hela were !
Ji bo te bêjim eşkere

Lê Markisî nabî dubin
Gernas di binde radibin

Destan bidin hev bibne yek
Êrîş bikin dijmin bi çek

Hela were, hela were !
Ji bo te bêjim eşkere

Bibin fidakarên welêt
Ji xwe bikin şerm û fehêt

Êrîş bikin dijmin bi şer
Gava şikest win bidne ser

Hela were, hela were !
Ji bo te bêjim eşkere

Herwek Viyetnam şer bikin
Dijmin ji hev ker-ker bikin

Dostên mene tev Markisî
Turk û ereb û farisî

Hela were, hela were !
Ji bo te bêjim eşkere

Hevsar medin dest borcewaz
Mebin çera hirç û beraz

Cotar û herçî dest qirêj
Em tev birane hê ji mêj

Hela were, hela were !
Ji bo te bêjim eşkere

Welat bixwazin rast û çep
Turk û ecem, kurd û ereb

Destan hemî em bidne hev
Lê nebtenê bêjin bi dev

Hela were, hela were !
Ji bo te bêjim eşkere

Her yek di nav qada xweda
Dest bidne hev jar û geda

Herçî hevalên koledar
Ji bo me ew herdem neyar

Hela were, hela were !
Ji bo te bêjim eşkere

Çend sale ev qîr û hewar
Carek ji xew nabin şiyar ?

Îro şiyarbûne ji xew
Dîsa dibin wek çêlekew

Hela were, hela were !
Ji bo te bêjim eşkere

Şah û beg û axa neyar
Dost û hevalên koledar

Şêx û melayên sexteçî
Em kirne "sofî" û "hecî"

Hela were, hela were !
Ji bo te bêjim eşkere

Dest bidne hev tev mêr û jin
Xort û keç û biçûk, mezin

Em tev ji vê berpirsiyar
Besin ji xew rabin - şiyar

Hela were, hela were !
Ji bo te bêjim eşkere

Cihan hêjî bûn dubend
Wan dane mil gurz û kemend

Bendek li jor û yek li jêr
Bendek bi xwîn û yek bi zêr

Hela were, hela were !
Ji bo te bêjim eşkere

Şêr şêre, jinbî yan jî mêr
Navê tevan danîne şêr

Gava ku tê dengê piling
Destê me naçî ser tiving

Hela were, hela were !
Ji bo te bêjim eşkere

Xûşkê tu jî hînbe şera
Zû nasbike derb û bera

Wek mêr tu karî şer bikî
Dijmin ji hev ker-ker bikî

Hela were,xûşkê were !
Ji bo te bêjim eşkere

Benda me gernas, xurtemêr
Lê tev nezan û tev nekêr

Bê zêr dibin destê neyar
Ta kengî em nabin şiyar ?

Hela were, kaka were !
Ji bo te bêjim eşkere
Heval şiyarbe, rê bizan
Dûrkev ji destên van dizan

Hela were, hela were !
Ji bo te bêjim eşkere

Cotar û karkar, xwendewar
Tev bibne yek em dost û yar

Gernasî karî şer bikî
Dijmin ji hev ker-ker bikî

Hela were,hela were !
Ji bo te bêjim eşkere

Ev perçebûn nejber xwe tê
Gayê zexel naçî xetê

Barê giran, ker naçî ber
Seyda ji ber xûn bû ciger

Hela were, hela were !
Ji bo te bêjim eşkere

Kurdên ji Zagros û Keper
Çawa bitirsin ew ji şer ?

Guh medne van şêx û bega
Çavsor dibin wek conega

Hela were, hela were !
Ji bo te bêjim eşkere

Hawîr biborin wek beran
Pîkol bikin li her deran

Tirsê bixin cergê neyar
Hem xûnvexar û koledar

Hela wera, hela wera
Seyda ciger xûn bû bira !

## KEKO EZ BILÛRVANIM

Keko ez bilûrvanim
Bi her tiştî dizanim

Çiyan tênim govendê
Berxê mîjo di bendê

Hirç û hov û dar û ber
Lotan didin tev li ber

Ev masîyên Derya Reş
Bi bilûra mi serxweş

Welat tijî bûn ji deng
Tên dîlanê şox û şeng

Keko ez bilûrvanim
Ez şivan û gavanim

Rûniştîme bin darê
Didim pesnê biharê

Dengê saza min zîze
Darbilûra min gwîze

Ez pif dikim bilûrê
Dil agire dikûrê

Şiyarbûne rast û çep
Turk û taçîk û ereb

Vexwariye me ev durd
Ji bo şiyar bikim kurd

Lê ez çibkim ranabî ?
Nizanim wê çawabî ?

Nizam kere yan jî ker ?
Ez bi gurzan tême ser

Serî hişke wek kevir
Divê bişkê bi bivir

Divê gurzan deynim ser
Yan jî jêre bêjim her

Dijmin dêwê xwînvexwar
Welat kirye tar û mar

Hirç ketiye nava rez
Li min bûye lez û bez

Dikim hawar û gazî
Bi vî dengî, vî sezî

Kes guh nadî saza min
Qîr-qîr û gaz-gaza min

Kurdno hemî bibne yek
Dest bavêjin gurz û çek

Werin şerê hirç û dêw
Biparêzin mal û mêw

Ji vî bextê minê reş
Ez nexweş û ew nexweş

Bê xwedîne rez û mal
Ezê çibkim pîr û kal

Rezê minê ji kerkûş
Dijmin xwar û maye pûş

Dikim qêrîn û gazî
Dilê min wer dixwazî

Ez pêwanim bilûrvan
Ne mêrkujim, dilovan

Bi guv-guv û bi nalîn
Kurd ranabî Ciger-xwîn !

## BARGIRANIM

Bargiranim ez, rê dûr û serkaş
Xûzim, pistkulim, dimênim li paş

Kerwan xwe gihand qûnaxê sivik
Ker-ajo nezan û rêçika me şaş

Bargiranim ez, piştkul û birçî
Li paş karwan jî herim dîsa baş

Milet nezane, ejî perîşan
Lêdan û zindan, kuştin jî, rapaş

Milet dixwazî sivik herim pêş
Lê bar girane, têre, li ser xaş

Bi zor min tajon, nizanim ka rê ?
Li pêş me: av û çirav û co-aş

Ketin û rabûn, lê tim diçim ez
Dilê min pir xurt, bi fort û şabaş

Barê min giran, berê min li jor
Rêça min dijwar, hemî rêl û kaş

Dengek ji dûr hat gote min:
Bar hilgir weza, sêfîl û bê maş !

Jêre divên: êm tîmareke baş
Em derdê bargîr, av derdê ger-aş

Pêncî salin em ji wer dibêjin
Bargiran, piştkul wer diçim li paş

Ciger-xwîn, besin gilî û gazin !
Di nav nezanan nabênî yek baş !

## FORT Û PORT

Kurdim: kurmanc, lor, gor û kelhorim
Zazim, bext û mil û kîk û torim

Şorişgêrim ez azadîxwazim
Pîkolê dikim, hawîr bor-borim

Derketim çiyan, ne razan,ne xew
Navêm vî sedî weha raborim

Bi çarox û rext gêrbûm ser qadê
Berjor dibezim, tim ber li jorim

Benda sipîdê mame ku bêder
Çavnêrê şewq û şefeqa sorim

Dijminê maldar, koledar herdem
Çibkim, hevçaxê mirovên korim ?!

Kurdim gernas û mêrxas û dilpak
Sînorparêzim, li êş bi dorim...

Çend sînor danîn li ser dilê min
Xwedî qadim ez, lê bê sînorim ?!

Bax û rez û pez, qad û xanî tev
Dijmin sitandin, yanî natorim

Lê çima dijmin tim xurt û ez qels ?
Bê dezgeh, xwendin çi ton pisporim ?!

Ciger-xwîn dikî hawar û qêrîn
Pêncî salin ez qore-qorim

## BIRCA GERNASAN - TILZATER

Çêkroxê şêran Wargeha - Zater !
Jêdera mêran Wargeha - Zater !
Aferîn jêre Wargeha - Zater !
Bijî serbilind ey Girê-Zater !

Dijmin bi êrîş dihate ser te
Top û tang û çek kişande ber te
Li ber wan danîn, sênc û çeper te
Bijî serbilind ey Girê - Zater !

Li ber pozê wan, tu bûyî kelem
Êrîş tanîn te, ereb û ecem
Te ew dikuştin dil bi kul û xem
Bijî serbilind ey Girê-Zater !

Li te bûne yek tev kevneperest
Êrîş tanîn te, wek dijmin dixwest
Te şerê wan kir bi sîng û bi dest
Bijî serbilind ey Girê - Zater !

Te dane kuştin pir xortên keleş
Keçên çavbelek, zarokên rûgeş
Dê û xûşk û jin hiştin serbireş
Bijî serbilind ey Girê - Zater !

Tu bû meydana cenga Felestîn
Ji bo serbestî te rijandî xwîn
Gernas û şervan serbilind dijîn
Bijî serbilind ey Girê - Zater !

Azadîxwazan destên xwe dan hev
Gullebaran bû, bi roj û bi şev
We xwe da kuştin lê qet nebû rev
Bijî serbilind ey Girê - Zater !

Li ser te bûn yek tev mizgevt û dêr
Berê te li jor, berê wan li jêr
Va em dinivîsin navê te bi zêr
Bijî serbilind ey Girê - Zater !

Te dane zanîn; çine rast û çep
Bûne dubendî ecem û ereb
Li meydana şer bûn celeb-celeb
Bijî serbilind ey Girê - Zater !

Benda azadî, benda imperyal
Belengaz hemî em bûne heval
Yek daxwaz û dil, yek-ol û yek-al
Bijî serbilind ey Girê - Zater !

Ji bo me divêt hinek hişyarî
Ko em derbaskin van demên tarî
Dijmin wê çaxê bi me nikarî
Bijî serbilind ey Girê - Zater !

Kevneperestên cihan bûne yek
Alî hev dikin bi mal û bi çek
Hawîr digerin bi şer û bi dek
Bijî serbilind ey Girê - Zater !

Dema ku dişkê serê koledar
Mat û mest dibin li herder neyar
Zivistan diçî li pey tê bihar
Bijî serbilind ey Girê - Zater !

Karter dipirsî li mafê mirov ?!
Gelo nabênî ev hirç û ev hov ?!
Me didin kuştin li herder bi tov
Bijî serbilind ey Girê - Zater !

Eger em rabin besî xwene, bes !
Hevsar nedin dest mirovên teres
Xwîna me nerjî guh nadî me kes
Bijî serbilind ey Girê - Zater !

Barê me giran, şerê me dijwar
Dijminê me xurt, jîre koledar
Êrîş tênin me gurên birîndar
Bijî serbilind ey Girê - Zater !

Xwezî hebûna me jî hezar mêr
Kurdên qareman tev bi çek û zêr
Bihata hana te tev wekî şêr
Bijî serbilind ey girê - Zater !

Azadîxwazin dijminê neyar
Dostê haştîxwaz, dijê koledar
Nûjenperestin dijminê kevnar
Bijî serbilind ey Girê - Zater !

Bijî Kurdistan azad û serbest
Bimrin, hilweşin tev kevneperest
Nema dixwazin wer bijîn bindest
        Bijî serbilind ey Girê - Zater !

Gernasê Zater, hezar aferîn !
Gernasê Libnan, şêrên Felestîn
Hevalê weye herdem Cigerxwîn
        Bijî serbilind ey Girê - Zater !

Libnan, 9.2.1977

## AZADİXWAZIM

Tîp û lekên kurd ketin zinaran
Li hawîr bumba bû gullebaran
Êrîş dibin ser komên neyaran
De rabe ser xwe,kurê min rabe !

Şev ta sipîdê me nîne qet xew
Cihan li ber me dibîte rew - rew
Nêrkew nexwenî, çi bêjî mêkew ?
De rabe serxwe, kurê mi rabe !

Bavê te çû şer, şêre li meydan
Êrîş dibin ser İran û Tûran
Destên xwe dan hev kurmanc û dostan
De rabe ser xwe, kurê mi rabe !

Kengî mezinbû, divêm bixwênî
Rewşa cihanê tu xweş bibênî
Ji nû tu karî dijmin derênî
De rabe ser xwe, kurê mi rabe !

Keç û kurên kurd hemî şiyarbin
Ji bo serbestî hemî li karbin
Ji hevre dostbin, dijê neyarbin
De rabe ser xwe, kurê mi rabe !

Dijware dijmin, Tûran û Firse
Gernas û mêrbe, ji wan metirse
Sibê şiyarbû, li min mepirse
De rabe ser xwe, kurê mi rabe !

Ji bo ku xweşbin dem û gavên te
Ezê sipîdê bighêm bavê te
Bere ziwabin herdu çavê te
De rabe ser xwe, kurê mi rabe !

Milên xwe bidme milên berane
Di şerde em tev xûşk û birane
Êrîş bikin em, lê şer girane
De rabe ser xwe, kurê mi rabe !

Bizane, xwendin ji bo we derman
Da ku bizanin qanûn û ferman
Derxin ji dil em van tirs û şerman
De rabe ser xwe, kurê mi rabe !

Destên xwe bidne destên çepên rom
Bibin partîzan bi leşker û kom
Carek metirsin ji "hok" û "fantom"
De rabe ser xwe, kurê mi rabe !

Dibî bavê te di şerde bimrî,
Zinhar kurê min nebî tu bigrî
Em têne kuştin ji bo tu nemrî
De rabe ser xwe, kurê mi rabe !

Dijmin naçî der bi lav û gazê
Xwînê nerêjî naghê daxwazê
Siba diçim şer divêm tu razê
De rabe ser xwe, kurê mi rabe !

Şêx û melan em tev kirne derwêş
Ev bû du sed sal, em bûne berbêş
Ba bêne kuştin, nemênî ev êş
De rabe ser xwe, kurê mi rabe !

Şîn tê bi xwînê dara serbestî
Îdî naxwazin dîlî, bindestî
Ev êlperestî, ev olperestî
De rabe ser xwe, kurê mi rabe !

Mirovperestim mîna Cigerxwîn
Serbest bijîn tev, ne wek "Mem" û "Zîn"
Jîna serbestî, divê me ev jîn
De rabe ser xwe, kurê mi rabe !

## DAYÊ TU MEGRÎ

Rom û ecem tev welat vegirtin
Bindest dijîn em, ji ber ku kurdin
Çira û rewşen li me vemirtin
        Ger bêne kuştin,dayê tu megrî !

Xwendin nehiştin li nav me kurdan
Ne hiş, ne bîr man ji êş û derdan
Ev bax û bustan,ji dest xwe berdan
        Ger bêne kuştin, dayê tu megrî !

Şêx û began tev em kirne kola
Bê maf û bê cî berdane çola
Dan ser milên me darên dehola
        Ger bêne kuştin, dayê tu megrî !

Mizgîn ! tu şabe va em dixwênin
Azadîxwazên cihan dibênin
Divê ku dijmin bi zor derênin
        Ger bêne kuştin, dayê tu megrî !

Va em şiyarbûn, xwende û zana
Me rê tev girtin ji ber nezana
Zû, zû me naskir ev reng dizana
        Ger bêne kuştin, dayê tu megrî !

Dijmin du nifşin: hundir û derve
Hinek di binve, hinek di serve
Kurdên nezan jî tên me bi serde
        Ger bêne kuştin, dayê tu megrî !

Divê ji bo te em rast bibêjin
Bindest û kola tim jîndirêjin
Nabin xwedî maf, xwînê nerêjin
        Ger bêne kuştin,dayê  tu megrî !

Em tev diçin tên, dolab û çerxin
Mebîne ko em ciwan û ferxin
Divê ku dijmin ji nav xwe derxin
        Ger bêne kuştin, dayê tu megrî !

Divêt bi leşker herin zinaran
Konê xwe vegrin li pêş neyaran
Êrîş bikin em bi gullebaran
        Ger bêne kuştin, dayê tu megrî !

Reşa xwe bavêj, dayna cilên xwe
Kelaşînkofê bavêj milên xwe
Xeman em derxin ji nav dilên xwe
        Ger bêne kuştin, dayê tu megrî !

Sûndê dixun em bi pût û late
Heta ku negrin Zab û Ferate
Serbest nikarin em bêne ba te
        Ger bêne kuştin, dayê tu megrî !

Rabe bi hevre em herne şaxan
Derman bikin jin: laş û kelaxan
Ronî bidin xweş rengê çiraxan
        Ger bêne kuştin, dayê tu megrî !

Milên xwe bidne milên me şêran
Di şevreşan bin rengê sitêran
Şêr tevde şêrin, çi jin çi mêran
        Ger bêne kuştin, dayê tu megrî !

Dayê em xortin xwîna me germe
Bindest bimênin ji bo me şerme
Ta kengî dijmin paşa li ser me ?
        Ger bêne kuştin, dayê tu megrî !

Îdî me navên ev reng û ev jîn
Em tev şiyarbûn Ferhad û Şêrîn
Em guh didêrin dengê Cigerxwîn
        Ger bêne kuştin, dayê tu megrî !

## LI ROJHILAT

Şev reş û tarî, bahoz û bandev
Nakevî dest me: ne razan, ne rev

Hewrên rêzanî tarî û giran
Berfê bibarî, yan gulebaran ?

Ew reşhewravin kevneperestî
Tênin bîra min dîlî, bindestî

Dar bikevî dest mirovên xwînxwar
Dîsa dimênin birçî û hejar

Karê me dibî veşartin û rev
Tavê nabênin bi rojê em tev

Tênin ber çavan dijûn û lêdan
Şemaq û qamçî, kawçûk û zindan

Pêlên zordestî wek lehî û çêm
Xwe berdin ser me xum-xum û lem-lem

Di ber xwe dibin bîr û serbestî
Paşve dişkênin nûjenperestî

Tên perçiqandin tev destûr û rist
Raserî me tên ev kevnepirist

Benda Azadî li xwe napirsî
Belkî ez şaşim, ji wan natirsî

Tarîx û abor, herdu di gel me
Eger bitirsin ji bo me şerme

Badîhewane ev tav û bahoz
Eger em rabin hemî dibin toz

Vane, şiyarbûn cotar û karker
Dijmin têşênin bê ceng û bê şer

Çiqas bimênî ev cihan bê deng
Bê şer, bê kuştin, bê halan û ceng

Em her diçin pêş, dijmin diçin paş
Bê av digerin ev dolab û aş

Sermayeperest, tev top tavêjin
Nabênin îro çawan sergêjin ?!

Ev çi talan û çi ceng û pevçûn
Bila xweş bikin hemî cî û şûn

Hemî em mirov bibin wek bira
Cî nedin diza, rê nedin gura

Cihan xweş bikin tev bax û bihişt
Ne şûr, ne xencer, ne def û ne xişt

Kesek nemênî wek min dilbirîn
Ev dinya xweşe, dinya Cigerxwîn

## FERATIM -KÊFERATIM

Guj -guj û him - him Feratim, Ferat...
Xuş - xuş û xum - xum Feratim,Ferat...

Feratim, kêferatim
Karim, xebatim
Jîn û felatim
Vaye ez hatim

Ji jorve ez têm
Diçim ber bijêr
Di nav dilê min
Tev gewher û zêr

Feratim...
Bi him - him ez têm
Bê ser û bê bin
Ser derya mezin

Feratim...
Daxwaza milet
Feratê dijwar
Di ber xwe dibim
Tev gerş û gemar

Feratim...
Dengê sewîyan
Rengê birçîyan
Ez dengê şivan
Xama xwendevan

Feratim...

Tev ah û nalîn

Giryan û qêrîn

Bi çelq û lem - lem

Hemî kul û xem

Feratim...

Diçim pêş bi rist

Wek sitêr û rist

Hemî derd û kul

Dikevim nav dil

Feratim...

Di dilên xortan

Dikelim herdem

Ber pozê dijmin

Ez xîp û kelem

Feratim...

Ez xwendewarî

Ezim hişyarî

Dûr û dirêjim

Gavan tavêjim

Feratim...

Di nav dilande

Pir xurt û bi tîn

Di nav damarên

xortande bûm xwîn

Feratim...
    Di ser hevre têm
        Bi çelqîn û guj
            Di ber xwe dibim
                Dijminê xwînmij

Feratim, karim, xebatim
    Ez kêferatim
        Vaye ez hatim

Ji Kurdistanve têm
    Pir xurt û bi tîn
        Ez pêta cerg
            Û dilê Cigerxwîn

## DI BİR ANİN

Ey dilo jaro li kûne,
Deşt û zozanê dimin ?

Kanî ew cejn û sema û
Geşt û seyranê dimin ?

Çaxekî dûr û dirêje
Ko ji wan dûr bûme ez

Guh bide ber qîr
Û nal û ah û evxanê dimin

Min divê ku nû ciwanbim
Biçme nav bax û rezan

Kanî ev reng nûciwanî ?
Kanî bostanê dimin ?

Şahî û nûroze îro
Tên semayê kesk û sor

Têne ber çavên me gav û
Çax û dewranê dimin

Keske sorin çox bi surme
Ser bi zêrin cerg û bez

Ka li kûne: dehrî û
Xeftan û mîtanê dimin ?

Ah di bîra minde mane
Ew demên şêrîn û xweş

Tevger û lîzên bi lotik
Deng û xoşxwanê dimin

Min di nav bax û rezande
Lot didan bê tirs û pirs

Min gul û nêrgiz didan hev
Ka gulistanê dimin ?

Serxweşê dengê bilûra
Wî şivanê ber zinêr

Kanî îro ew bilûr û
Ew bilûrvanê dimin ?

Tev di bin lingên neyaran
Tên pelaxtin yek bi yek

Ew kelat û ew sera û
Birc û eywanê dimin

Ey Cigerxwîn bes bibêje
Pir dirêje ev deram

Maçê lêvê erxewanî
Derd û dermanê dimin

## KEKO ZIMAN DIRÊJIM

Keko ziman dirêjim
Mexeyde ez çi bêjim
Ez xêrxwaz û dilovan
        Bê toz û bê Qerêjim

Ziman ê min û te ye
Nîsk û genim û ce ye
Gelek zîwan têde ye
        Niha jêre werbêjim.

Genim hemî zîwane
Bê rûmet û erzane
Bi ser hev de ber dane
        Lê ez jêre girbêjim

Zimanekî kevnare
Çend sale ko beyare
Di bin lingê neyare
        Bi ser we de navêjim

Ne ez şêxim, ne mewla
Li kes nakim teşqela
Ji ber van derd û kula
        Bê rojî û nimêjim

Kurê Kardox û Mîtan !
Di tarîxê pehlewan
Menêre ko bindestim
        Kevnare û ji mêjim.

Rîsê xwe min bada ye
Min ristiye, rada ye
Xelkê tenûr dada ye
        Ez nanê xwe dipêjim

Tarîx diçî ber bi pêş
Barê we min bire êş
Nû hatiye hebûnê
        Tu rûnî, ez dewêjim.

Tim dixwazim azadî
Divêm xweşî û şadî
Bê zor kesek heq nadî
        Ne faşist û xwînrêjim

Şer naxwazim, haştîxwaz
Bi lav-lav û gaze-gaz
Nabî şerê borcewaz
        Ez ne dînim, ne gêjim

Min xwest ku bibme rêber
Bi tîp û top û leşker
Bi dijmin re bikim şer
        Lê nikarim bipêjim

Ma ez çibkim nîne pişt ?
Çibkim ji tizbî û xişt ?
Çûkim dikim qişte-qişt
        Van ristan ez dibêjim

Çi hatiye serê min
Bar girane kerê min
Ez lê didim mexel tê
        Nizanim ez çi bêjim ?

Heftê salin Ciger-Xwîn
Dil û kezeb bûn birîn
Gelek fersende me dîn
        Zanibî ez ne hêjim !

## DILBER GELEK CIWANE

Dilber ciwane şirîn û rinde
Şox û şepale bejin bilinde
Serî gihaye ber taqê gerdûn
Li ser serê wê taca Ferîdûn

Bi jêr de berdan gulî û reşbisk
Kiras bihare, sor û zer û kesk
Dur û cewahir ji dême, xweş rû
Kevanê Behram-çopîne ebrû.

Du çavê mêrkuj, pingav û petrol
Lê sîng û gerden Cezîr û Bîngol
Hêstir ji çavan cobar û robar
Li ser me digrî, nalîn û hawar

Hebûn û dewlet, li her der û cî
Em têde jar û bê nan û birçî
Bêgane têde bûne ciwanmêr
Xistin destên xwe ev dewlet û zêr.

Li ser me paşa, bi top û leşker
Şêx û begên me ji wan re rêber
Kurdên perîşan-gavan û gundî
Kola û bindest, zencî û hindî

Ez tim dinalim, hawar û gazî
Destên hev bigrin, birçî û tazî !
Bi ser çiyande bi deng û halan
Bi zor bistênin ji dijmin talan

Heçî nikarî doza xwe bigrî !
Di bin zencîrê dijmin de dimrî
Ewê nikarî hilkişî ser şax
Di bin lingan de diçî, dibî ax.

Eger nexî dest tu dar û dewlet
Di nêv cihan de tu nabî milet !
Dijmin gihaye, bi top û leşker
Êrîş dibî me wek dêwê sêser

Çavên xwe vekin, binêrin Vîtnam
Bûne yek perçe, pismam û dotmam
Bi xwîna dijmin sor kirne meydan
Cergên neyaran xweş dax û key dan.

Li ser serê wan tim gulebaran
Zarok tên kuştin wek berx û karan
Lê tim diçin pêş hemî jin û mêr
Dijmin dişkênin wek piling û şêr

Bi camêrî tev xwe didin kuştin
Naxwazin bijîn bindestê dijmin
Divên ko bijîn serbest û azad
Di qada xwe de rûgeş û dilşad

Bikevin rêza miletên serbest
Naxwazin bijîn hejar û bindest,
Xwelî li we bî, şazde milyon kurd
Bindestê dijmin hejar û zigurd !

Belengaz,reben,mest û perîşan
Nikarin bixun têr nan û bacan
Bere em bimrin, herin av û av
Di nav xelkê de bê dewlet û nav

Li şûna axê, çawîşê Nuqtê
Malê me dixun bi me çi xweş tê
Çekan dikirin da hev bikujin
Dijmin xwîna me hawîr dimijin

Dixwazim rabin ji tamara xew
Ji dijmin re em nebin çêlekew
Pêzan û rêzan, bi tektîk û jîr
Hozanên rêber bibin destegîr !

Bûkê biguhêzin, bigrin Kurdistan !
Li her der bikin govend û dîlan
Em tev de bixun hatin û hebûn
Di nav me de kes nebî Cigerxwîn.

Lê win zanibin qerêj û hebûn
Bikêr we nayên roja serxwebûn
Lê ê ko îro bidî bi rindî
Para wîye tim payebilindî.

Dema kurd bibî serbest û azad ;
Ê çikûs û pîs dimênin bêdad
Çavên xwe vekin kurdên borcewaz
Rencberê dijmin, tirek û tolaz

Destên xwe bidin kurdên palewan
Dakevin meydan, bi mal û bi can
Ev roj ya we ye, werin bi rindî
Destên xwe bidin karker û gundî.

Bajarî, gundî, jîr û xwendewar,
Hawîr bigerin weke gurên har
Tenê bi zanîn û bi tektîk û pîş
Bi pêş ve bajon hemî kar û îş

Markisî, Norsî, tev welatperwer
Destên hev bigrin, bibin yek çeper
Ta xanî ava nekin bi rindî
Li ser boyaxê mekin dubendî.

Ji destê dijmin me welat derxist
Bere bên meydan çend awir û rist
Wê çaxê raste ku em bigrin hev ;
Lê ne bi kuştin, bi ziman û dev

Ma kî dibêjî: qelse kewê min ?
Yan kî dibêjî: tirşe dewê min ?
Lê îro dijmin serdarê welêt
Em jî ji hev re bibin ar û pêt.

Xurtî ya me ye, yektî û zanîn
Koka xebatê pê tête danîn
Destên we bişkin, çi ton mirovin ?
Kengî şiyar bin ne hirç û hovin ?

Diçin bihiştê gernas û mêrxas
Dojeh şûna ên bindest û pêxwas
Xwenda û zana dijîn bi rindî
Xwelî li wî bî, heçî ne xwendî.

Bêtir ew kurdên gernas û dijwar
Nexwendî, birçî, boyeçî, binbar
Bexda û Mûsil, Haleb û Bêrût
Hatin dagirtin ji kurdên pêrût

Bin darê dijmin kola û bindest
Di bin baran de pişta wan şikest
Dijmin bi xwendin wezîr û paşa
Li ser pişta me dixun *me-aşa*.

Ji dijmin re em xweş dibin leşker
Şoriş gur bûye lê em naçin şer
Dewlemendên kurd weke hirç û gur
Malên xwe didin dijmin hûr û gir

Ne didin şoriş ne didin partî
Nayêne gotin herçî veşartî
Bi ser de êrîş me dikin wek hov
Çavên wan birjin, ev renge mirhov.

Ji bo we ye em divên serbestî
Ji ser we rakin dîlî û mestî
Em bi mal û can, tenê win bi mal
Xebatê bikin tev dost û heval

Xwelî serin win, gemar û çikûs !
Bikevin dexlên we reqik û sûs
Dijmin bistênî ji we mal û qad
Birizin, bimrin, bê kok û binyad.

Xebatkar dema dikevin zindan ;
Li ser wan nagrîn, dikenin bi wan
Bi wê gemara ber destên dijmin
Di ser me ra win xwe bilind dikin

Devê xwe li me vekirye reşdêw
Ji xew ranabin, kurdên kurê Gêw
Hawar dikim ez bi rengê Zardeşt
Bese, nemaye, dema def û xişt

Dema tang û top, firok û sarûx
Nayên hana me Yezdan û Merdûx
Warên xwe berdan sawîr û goman
Candar gihane rajorê ezman.

Di vê demê de bê xwendin û çek
Li ber dîwaran bê nan û parsek
Di bin lingan de wek pûş û pelax
Dimrin, dirizin, hemî dibin ax.

Rabin bi xurtî, milhasin û mêr
Li ber dijmin em rabin wekî şêr
Di bin kevir de namênî giya
Ji ber bahozê xwar nabî çiya

Cî nadin revê qet şêr û piling
Zora me nebir sedsalî Firing
Şêrên: Dimyat û Ekka û Hettîn
Navê me kurdan bi zêr nivîsîn.

Bav û kalên me: Hewrî û Mîtan
Bi zor danîne sînorên kurdan
Kardox û Kaşo, Madî û Sobar
Wan bi xwîna xwe parastin ev war

Ne şerme, ko em gernas û kurdin
Ji dijmin re em warên xwe berdin
Bi hev re rabin cotkar û karker
Zana û rêber, pala û rencber.

Destên hev bigrin bi rast û ronî
Di qada xwe de şazde milyonî
Kî bûye dewlet bi tizbî û xişt ?
Parsek û bindest çon diçin bihişt ?

## LEYLA ŞEHİD

Şêr, şêre, mêre yan jine
Nîşan bi dest, Leyla mine
Polaye dil wek asine
Leyla kîye ?
Leyla jine.
Leyla mine
Leyla mine...

Leyla mine, Leyla welêt
Wê dil li min kir ar û pêt
Mizgîn li kurd roja me têt
Dijmin ji tirsan maye şêt
Leyla çiye ?
Leyla jine.
Leyla mine
Leyla mine...

Sitêr ji ezman hate xwar
Zer bûn li min bax û bihar
Rabin ji xew ey xwendewar !
Tev mêr û jin bibne şiyar.
Leyla kîye ?
Leyla jine.
Leyla mine
Leyla mine...

Daser te taca Erdeşêr
Navê te dinvîsim bi zêr
Jin nû dibin wek şêr û mêr
Leyla çiye ?
Leyla jine.
Leyla mine
Leyla mine...

Leyla keça *Mît* û *Meda*
Canê xwe da di ber me da
Bijîn heçî ko canfida
Xweş bin ji te jar û geda
Leyla kîye ?
Leyla jine.
Leyla mine
Leyla mine...

Leyla delal û pir çeleng
Leyla ciwan û şox û şeng
Xwe daye kuştin wek pileng
Şêre li nav kurd daye deng
Leyla kîye ?
Leyla jine.
Leyla mine
Leyla mine...

Leyla çiraxa şevreşe
Wê rû li kurdan kir geşe
Kuştin bi me kurdan xweşe
Zordarî îdî nameşe
Leyla kîye ?
Leyla jine.
Leyla mine
Leyla mine...

Bi wê li kurd ron bûye şev
Jin bûne wek Leyla me tev
Îdî nema hêjaye rev
Ey kurd de destan bidne hev !
Leyla kîye ?
Leyla jine.
Leyla mine
Leyla mine...

Divêm li pey te bêm ejî
Çibkim bi vê jîna rijî ?
Xwînê nerêjî napijî
Leyla bijî,Leyla bijî !...
Leyla çiye ?
Leyla jine.
Leyla mine
Leyla mine...

Pir şerme ey xortên ciwan !
Keç bêne kuştin pehlewan
Win jî temaşa kin li wan
Rûmet çiye ey xwendewan ?
Leyla çiye ?
Leyla jine.
Leyla mine
Leyla mine...

Êrîş bikin rengê Ziya
Zû derkevin jorên çiya
Bigrin li ber dijmin riya
Ka: Hor û Mît û Mîdîya ?
Leyla kîye ?
Leyla jine.
Leyla mine
Leyla mine...

Leyla bijî, sed aferîn
Ji bo me bûye ol û dîn
Dîsa li min derbûn birîn
Hetta ciger min bûye xwîn
Leyla kîye ?
Leyla jine.
Leyla mine
Leyla mine...

## WELATE ÇIRTO Û VIRTO

Şêrê sorê ser mezin
Pir bi saw bû weke cin
        Rokê rasthat li rovî
        Dî ko di dev de hirmî
Go: Rovîko, ev çiye ?
Rovî go: ev hirmî ye
        Li ku hene ev hirmî,
        Li çi şûnê, li çi cî ?
Rovî bi fen gote şêr:
Divê ko dakevin jêr
        Tev daketin bin darê
        Çendek dîtin li xwarê
Rovî civandin wek mêr
Danîn li ber devê şêr
        Şêr go: Rovî, çi xweşin
        Lê ka çawa diweşin ?
Rovî go: paşayê min
Dûvê xwe em lê didin
        Yek û do û sê û çar
        Ji banî ve têne xwar
Şêr jî dûvê xwe lê da
Lê xêr nedî di wê da
        Go: Rovî, ka naweşî ?
        Rovî çû, hat û meşî

Go: paşayê hov û sirt
Pişta we ye gelek xurt
Şêr pişta xwe da darê
Hirmî nehatin xwarê
Rovî go: ka raweste,
Renge pişta te siste
Ezê niha herim, bêm
Bicivênim heçî kêm
Rovî çû mirarek dî
Zû rêvîya wî anî
Şêr pişta xwe da darê
Rovî dest kir bi çarê
Rêvî lê pêçaye tev
Ji neynûkê, heta dev
Divê hinek rawestî
Belkîjî pir biwestî
Germe xurte wek agir
Rêvî kire wek çekur
Dema parsû gihan hev
Şêr go: rovî, fene ev !
Rovî go: raste weye
Ev der welatê me ye
Ev ne cihê şêra ye
Cihê qelsemêra ye
Welatê rovî û gur
Şêr nikarin bêne vir

Mişkê bixun çavê te
Şêr go: çiye navê te ?
Navê min çirto axa
Xwedyê van şax û baxa
Rovî ji cem daye rê
Weke gernasên berê
Dûv lê bûye weke sing
Çav li serî bûn pereng
Şêr çend rojan wilo ma
Ji birçîna, ji germa
Serî bi ser de hat xwar
Ne eman û ne hawar
Dî ko mişkek hate wir
Wî jî terî bilind kir
Go: ha, şêrê ser kundir !
Kî bû wilo li te kir ?
Kesî diye li cihan
Ko şêr bêne girêdan !
Ezê niha te berdim
Da zanibî çi merdim
Çiqas em we xelas kin
Win qencîyê nas nakin
Mişkê terî bilind mêr
Dewêl birî wî li jêr
Li dor darê çû û hat
Bi tevger û kêferat

Şêrê birçî û xewar
Bi ser dev de hate xwar
Mişko pesnê xwe da, go :
Li min binêre yaho !
Ez gernas û çelengim
Mêrê rojên pir tengim
Li şêr sist bûye terî
Bi awiran lê nerî
Şêr go: bêje birazî,
Ka çi ji min dixwazî ?
Go: ez kolê derê te
Dewlet xwedê, serê te
Ez mişkê van dera me
Ne dilbijê pera me
Divêm ey şahê mezin
Tacê bidî serê min
Navê mijî bikî şêr
Bibim şahê ser bi zêr
Şêr go: navê te çiye ?
Xuyaye qeşmerçî ye
- Dibêjine min Virto
Navê bavê min Zirto
Lê şêr di ber xwe de go:
Ber bi ava diçî ro
Sed tif li vî welatî
Vî pîsî, bê xelatî

Rovîyên nav şikêra
Çawa girêdin şêra ?
Mişkê qulan me berdin,
Li ber şêran xeberdin !
Di van çax û van dema
Rûmet ji bo me nema
Bi şêrî û axatî
Nema bêm vî welatî
Şêr revî û nema hat
Bê şêr maye ev welat
Şêx û mela bûn çirto
Beg û axa bûn virto
Mil û Zîl û Kîk û Zaz
Bûne pisîk, tev beraz
Ji ber derdan ranazim
Ez şêrekî dixwazim
Em tev li dor bibin kom
Da bişkênin Firs û Rom
Li ser çiyan weke şêr
Welat bigrin tevlî zêr
Bostek nehêlin vala
Hevsar bidin dest pala
Rista me bî wekhevî
Herkes li bin vekevî
Çirto, virto, nemênin
Jin û mêr tev bixwênin

Min dil ji xem bûye mişt
Meger dilê we min hişt
Ava rû, win merêjin
Ji bo we em dibêjin :
Şer ketîye hindûrîn
Li vir bûme Cigerxwîn.

## ZIRA KERÊ LOTA DEVÊ

Di mêrgê deve û ker
Diçêrîyan ser bi ser
        Goştê wan tev bûye bez
        Ne sewal û nejî pez
Mexel bûne ber li hev
Bi ser wan de hatî şev
        Devê go: tira mi tê
        Kerê go: zira mi tê
Deve zû gote kerê
Pir nêzîkî meye rê
        Dibî hebin rêbiwar
        Wê me bajone bin bar
Ez ne xurtim wek cara
Pişt kul bûye ji bara
        Tijî wek min bike tir
        Nebî, bikî zire-zir
Lê ew kerê têr giya
Sivik rabû ser piya
        Heta jê hat kire zir
        Ew çol ji deng tije kir
Kerwanek diçû di rê
Çawa hat dengê kerê
        Yekî ji nava kerwan
        Barê kerê wî giran

Go: wa, dengê kerê tê
Vaye li vê derê tê
Du kes derketin ji rê
Berê xwe dan cem kerê
Çawa gihane mêrgê
Dîn ko ker û deve lê
Ew herdû dane ber xwe
Li wan kirin barê xwe
Xuyaye ker nezan bû
Barê wî pir giran bû
Xwe avête ser qadê
Nema diçim bi xwedê
Çiqas lê dan wan bi dar
Kerê xwe kir wek mirar
Barê wî jî dan devê
Ma wê çibkî wê şevê
Demek dîjî raborî
Bû firt-firta wî kerî
Wê şevê û wê revê
Ew jî danîn ser devê
Rewşa deve bû nexweş
Bû zirzira kerê reş
Deve jêre gazî kir
Go: te ya xwe bi min kir
Heta lota mijî bê
Tê bibênî wê çi bê

Şev çû li wan bûye roj
Newaleke weke doj
Teng û kûr û pir zirav
Jêrê wê jî tijî av
Deve bakire kerê
Xweş binêre vê derê !
Go: wey malik mîratî
Ma wiloye biratî
Lê deveyê hêc û har
Lotek da xwe hate xwar
Kerê reş û tevlî bêr
Teqlo-meqlo çûne jêr
Deve go: xwe bigre baş
Gelek serjêre ev kaş
Lê kerê reş çû û çû ;
Heta perçe-perçe bû
Raste bostek nezanî
Dibî gazek xezanî
Ew hevalê bê mijî
Tejî bi xwer dikujî
Dema ko zira wî tê
Derdikevî ji xetê
Ewî kerê bîrnebir
Barê deve giran kir
Li ser pişta wî bû bar
Paşê çilo hete xwar

Ew hevalê pir xiniz
Paşê dibî qelawiz
        Ew xwe dixî bin bara
        Dibî kerê neyara
Emanet û sed zinhar
Ji pîsa re mebe yar
        Bi çewtî jî bilîzî
        Dengê te nabihîzî
Bê şêwir û bê biryar
Weke zanî, dikî kar
        Ne hiş heye, ne mijî
        Tejî bi xwer dikujî
Ey hevalên partîzan
Win guh medin ê nezan !
        Wî tim ji xwe bikin dûr
        Bere herî cihên kûr
Tilya te bû penceşêr
Şer zêde bû, nema xêr
        Zû bibire tilya kul
        Da nexweşî neghê dil
Yek nexweşî bikêşî
Bere partî neyêşî
        Ziyan dikî wî xortî
        Paqij dimênî partî
Dema partî diçî pêş
Dijmin hawîr weke mêş

Sivik xwe dighênî nav
Şêlû dikî li me av
Xwe di kar de nakî sist
Lê tim dikî kurtepist
Êrîş dikî heçî baş
Dako xweş negerî aş
Kadir divê şiyar bin
Li her kesî guhdar bin
Tim rê ji ber wan bigrin
Ta bi jehra xwe bimrin
Tirsê dixin dilê we
Da pir bikin kulê we
Hina ji me dikin diz,
Hina dikin qelawiz
Devê wan tev qerêjin
Pir derewan dibêjin
Dibê: min wilo bihîst
Ne carekê, sed û bîst

Lê guh medê tev derew
Ê dibêjî, tenê ew
Ew radibî weke şêr
Belav dikî li bajêr
Da hin dîjî bibêjin
Lê em jî, wer ne gêjin
Mij tê çiyayên mezin
Tajî ji kêr dibezin ?

Me ser ne xistiye xew
Em nebûne çêlekew
        Bere bikin gije-gij
        Çiya natirsin ji mij
Kerwan diçî rê û rê
Dengê çiye li pey tê ?
        Ev rê raste em dirin
        Em ji vê rê nagerin
Nema divên paşatî
Bere bimrî qat-qatî !
        Em kurd hemî birane
        Barê me pir girane
Pişta me dibin de xûz
Lê em nakin kûze-kûz
        Divê em hilgirin bar
        Çiqas riya me dijwar
Ko xwîn nerjê weke av
Kî dikarî bighê maf ?
        Ev derê serxwebûnê
        Tev sor bûye ji xûnê
Bi van zendên birîndar
Divê ko hilgirin bar
        Destên bi xwîn neqşkirî
        Ew vedikin vî derî
Ji borcewazên kurd hin
Bûne sazmanê dijmin

Divên me derxin ji rê
Da xweş bikin şûn tirê
Xwe difroşin bi pera
Nema didin pey kera
Kerê reşê bi zir-zir
Ji ser devê ket û mir.
Ey gernasên xebatê
Pir bikin kêferatê
Êrîş bikin qelawiz
Zû rê bigrin li ber diz
Lê sazmanê borcewaz ,
Gelek jîr û gelek saz
Li waşenton dikelin
Lê zanibe ne delin
Tev rovî ne çekurxwer
Ew xwe li me nakin der
Peran didin kerên me
Dikin bela serên me
Bi gotinên pir qelew
Hawîr dikin lewe-lew
Da tirsonek birevin
Paşê li wan bicivin
Xwe dikin miletperwer
Da karibin bikin şer
Şerê heçî pêşketî
Çi serxetî, binxetî

Dijmin nabî dostê me
Divê bixwî postê me
        Kurdên Sûrî û Îran
        Bê xwendin û bê ziman
Lê wê arî kê bikin ?
Kurdistanê çêbikin
        Ey qelawizên pir jîr !
        Win binêrin li Cizîr
Tijî kirin biyanî
Ma qey tu jî nizanî !
        Tifke riwên va pera
        Xwe mefroş wek kera
Pir dilxwazê te me ez
Bere ji dest neçî rez
        Pir şerme dijmin bêjin :
        Kurd bicarek qerêjin !
Bê rêzan û bê rêber
Wan dikirin weke ker
        Emê wan berdine hev
        Virde rev û wêde rev
Ji bo qada xwe berdin
Bere bêjin em kurdin
        Kurdên çî ? û merdên çî ?
        Hemî tazî û birçî !
Derdikevin ji welêt
Derman nema li wan têt

Diçin kar û xebatê
Pir dikin kêferatê
Da ko nanê xwe derxin
Li pêş çirav û erxin
Kinc şil bûne ji avê
Dûv ketiye çiravê
Şêr li tevan daye lep
Şikandine dev û gep
Hawîr lêdan û zindan
Hemî mane perîşan
Pir bûne li wan sawîr
Pîrhevokan wîre-wîr
Dilê wan mişte ji tirs
Ji Ereb û Turk û Firs
Rojî, li wan bûye şev
Dil bi tirsin, dev ji hev
Wek leşkerê şikestî
Nema karî rawestî
Eger nebî yek serdar
Ma wê çibkin ev hejar ?
Tim li pêşe mêrê baş
Ew xwe carek nadî paş
Leşker li wî dibin kom
Êrîş dibin Firs û Rom
Heval, mebin mêresil !
Nebî tirsê bixin dil !

Heçî tirsê bibênî
Wê, çawa dest hilênî
Dema zira kerê çû
Deve nema bidî dû
Guh medin lîzên neyar
Çav vekirî, tim şiyar
Bi kêferat û zanîn
Bidin şopa Cigerxwîn.

## POR SIPÎ BÛYE - GILOK

Nexweşim ez di evîna
Tede dil bûye Bihok
Pîr û kalim ez dinalim
Por sipî bûye gilok

Ez li van şaxan dinalim
Hêstirên min têne xwar
Meyzeke herdû rexan
Zennarê dêman bûn cihok

Virde çûm û wirde çûm
Û ez ketim derya xeman
Şaş û cibbe min çirandin
Paşê bûme wek gerok.

Min ji dest berdane îro:
Zikr û tesbîh û nimêj
Tizbî û miswak firotin
Min bi: kab û xirxirok

Min Dihok girtî bi destê
Xo : û Mûsil da neyar
Ma ne dînim, min wesa kir?
Kanî Mûsil, ka Dihok ?

Xaniyê kok û binî
Ko li ser kabit bira
Rojekê dê hilweşî ew
Tev sitûn û tev bilok

Avjenî, ger xweş nizanî
Bo diçî golên di kûr ?

Zanibe ko Dicle nabî
Rengê ça û şirşirok
Barê rêzanî girane,
Kî dikarî hilgirî ?
Xweş bizane, ko di bin
Barande ker naçin bi lok
Meyzeke perwane çawa tête-
Suhtin ew bi ar ?
Ew nizanit: agire yan
Pertewa ronak û rok ?
Win dibêjin, ko siyaset
Tevde xapin yan derew
Wer mebîne nayê suhtin
Tim bi agir: firfirok.
Rûsipî dighê felatê
Ê welatperwer ji dil
Rojekê dê reş bikin
Herdû riwên ên: virvirok
Dê çilo em karibin
Derdê giran derman bikin ?
Ey Cigerxwîn bes bibêje !
"Sende yok" û "Bende yok".

## EY FELEK

Ey felek, ka ew sera û
Birc û qûnaxê dimin ?
        Ka rez û bustan û dar û
        Kanî ew baxê dimin ?
Çîçek û nêrgiz heriştin
Tev ji bîna sor - gulan
        Surperî nayên semayê
        Kanî qozaxê dimin ?
Qeb-qeb û dengê kewan
Nayên li ser lat û çiyan
        Kûre - kûre rengê bûman
        Naleya zaxê dimin
Ser bi zêr û çox bi surme
Dest li ber, rû nale - nal
        Dê bi kê xweş bin di dilde
        Ev key û daxê dimin ?
Bilbilê malik xerab
Herdem bi hewar û girî
        Xweş li ser sorgul dinalîn
        Bûne ortaxê dimin
Qumriyan sed renge awaz
Wan ji derdê nêrgîzan
        Bûm li ser kox û kelat û
        Qesr û çardaxê dimin

Dijminê zordest û zana
Tev welat girtin bi zor
Erdelan û Şehrezûr
Û şax û kurd - daxê dimin
Kurdê gernas ku şikandin
Tîp û komên ingilîz
Ketne bindestê neyaran
Bûne Altaxê dimin !?
Dijminê milet di îro
Bûne rêber bo welat
Ên bi xapan em dixwarin
Bûne ocaxê dimin !?
Ma gelo kevneperestim ?
Na, ne raste ezbenî !
Lê dixwazim zû şiyarbin
Dost û hevçaxê dimin
Ez ciger-xwînim li ser vê
Paşdemayina walêt
Rengê efyon tên firotin
Rist û ev xaxê dimin...

# BIRÊ CIVAKÎ

## JÎN Û HEBÛN

Di vê jînêde em tev dibên: ax
Wer em bighêne hev berî bibin: ax

Hosteyê jînê ev cihan çêkir
Ez û tu jêre herdû kirin max

Lemma evînê gava ku şîn hat
Ez têde binax, tu têde serşax

Kê em anîne, ji me nepirsî ?
Çine ev çend sal, çine ev qûnax ?

Kevn û nû yekin, lê dem diborin
Di vê jînêde em tevde ortax

Kê ev dîdarî, rindî dane te ?
Kê li dil danîn ev key û ev dax ?

Kumbeda cîhan yekser ava bû
Ji bo vî xanî ez û tu çardax

Cîhan pir xoşe: av û dar û ber
Lê em tev têde: dar û ber û bax

Ev jîna em tê şevreş - taristan
Ez û tu jêre: ronak û çir-ax

Em dûrî hevbin, jîn hêjaye çi ?
Candar, bîrewer tev dibin kelax

Em tev ciger - xwîn, bê ol û bê dîn
Nayên veşartin bi kinc û yeşmax

## SERXWEŞIM

Li meyxanê bila Xanî bî meyger
Bi yek camê dilê Camî bikî ter

Cizîrî û Herîrî bên semayê
Ko dilxweşbin bi dengê rist û nayê

Bi destê Ermenê bigrî Feqî xweş
Di dilda gur bibin sed pêt û ateş

Bila Batî bidî lotan li hawîr
Birîvkanî li her alî bikî qîr

Bila Nalî ji reşbiskan binalî
Ji maçên lêv û çavên reş xezalî

Bila Hacî û Macin wek Siyahpoş
Li wê navê binalin gêj û serxoş

Ku serxweşbin bi wan reş - xewne -xavan
Şikestî per di nav reşbisk û davan

Ku çîm sîmê li ser çoka mi rûnî
Bi min xweşbin ji dil jîn û hebûnî

Ji baxê paxilê bigrim du sêvan
Meyê firkim bi lêvan ez ji lêvan

Beranê kel li ber sîngê belendîr
Cigerxwînim dibim îro cihangîr.

## SOFIYÊ MEYXANÊ ME

Were da biçne meyxanê
Bila dîsa tu sofî bî
        Eger dil pak û paqij bî
        Ne ko sofîkî rovî bî ?
Li meyxanêbe dîsa dil
Bide yara xwe ey sofî
        Dibî wê çaxê sofî bî
        Ne wek îro tu mofî bî
Bila dil sade ronak bî
Li kû bî dê tu dilpak bî
        Li meyxanê li pûtxanê
        Dibî tav û ronî bî
Were da em vexun camê
Ji destê şox û dotmamê
        Li vê dinya xweş û şêrîn
        Çiman tê hirç û kovî bî
Çiman perda reş û tarî
Ji rengê şev li ser rû bî
        Ko dil xurt bî, bila herdem
        Di nav alayê romî bî.

Bila bedkar û sersem bî
Bila serpoş û kofî bî
Tu guhdêre def û nayê
Çi xweş gazî dikin sofî
Ko lerzîn têne canê min
Meger xirqe me poşî bî
Binêr sofî li vê xanê
Çilo wer hate meydanê ?
Heta kengî di zindanê
Wilo tim birçî û tî bî ?
Nizanî_ agir û avî
Ji oksocên û hem tavî
Heta saxbî di vî xanî
Bila dil tim bi hêvî
Tu destde zuhre sîmayê
Tu ghdêre def û nayê
Eve cenet li dinyayê
Bila dosta te horî bî
Dibim sofî di meyxanê
Me noşî mey ji fincanê
Disojim rengê perwanê
Ko yara min dixanî bî
Me şaş û cibe avêtin
Şerab û mey me tev mêtin
Ji lew em agir û pêtin
Bila şêx jê ne razî bî

Eger em biçne bin axê
Emê çibkin bi ax-axê
        Di vê qûnax û vê mafê
        Bila ola me manî bî
Bila dostê ji min xweş bî
Ko şêrîn-ken û rû geş bî
        Bila dil pêt û ateş bî
        Li min her tişt xuyanî bî
Bila yar tim bi minra bî
Qiyamet da li min rabî
        Wekî bilbil bi gulra bî
        Bi dil xoşî û şahî bî
Çiqas serhişk û sergerm bî
Di gel min ko xweş û nerm bî
        Meger bê hevser û germ bî
        Dixwazim ko ciwanî bî
Cegerxûnim, xwedî olim
Di ristêde çi bîngolim
        Wekû Ferhad çiya - kolim
        Li xwar bî, ya li banî bî ?

## EZ Û GUNDÊ HESARÊ

Hesarê gundê me ye
Deştek ne pir fireye
	Hawîr deştawê çiya
	Li jor darên devî ya
Herdû alî rez û dar
Heta dighê ber zinar
	Çend çiyayên xwedî nav
	Ko me li wan dikir rav
Şêx Sultan û Şêx Sehor
Çim û Hopê hawîrdor
	Deşta wê tev kanî ne
	Xo ew jêre danî ne
Hatina wê gelek pir
Rokê nebûn dexilkir
	Tirî, *êmîş* navdarin
	Heta berf tê li darin
Doşaba wê pir biha
Girantir bûye niha
	Ceh û genim gelek tên
	Nîsk û şolik belek tên
Pez û sewal gelek bûn
Li nav çiyan bi lek bûn
	Pembû, gelek diçandin
	Bi çinîn û kişandin

Qitî, *ecûr* û şebeş
Lê petîxên me pir xweş
Hirmî, Bihok û hejîr
Li ser daran dibûn pîr
Nifşên tirî hezarin
Belkîjî bê jimarin
Rêçel û gûz û benî
Gelek xweş bûn, ezbenî !
Gundê me jî gelek şên
Du ça dinav gund re tên
Qesra axê li jore
Hingî kevne reng sore
Qesra sora pir bilind
Bûye keleh ji bo gund
Abora gund zêde ye
Dewletek serbixwe ye
Tiştek tenê neçê bû
Zordestî ya axê bû
Kurtêlxwerên wî dijwar
Ji ber zora wan hewar !
Bêş û bela giran bûn
Ji ber wan em xezan bûn
Ji ber zora sengela
Derewên şêx û mela
Pişta me bû xwar û xûz
Bi axîn û kûze-kûz

Eşîr dibûn dubendî
Çi axa û çi gundî
Şer û şewat û talan...
Malik li me bû wêran
Dijmin diket nav welêt
Xwîna me tevan dimêt
Dar û qamçî û lêdan
Yan pere û yan zindan
Tev nezan û nexwendî
Yek jî nebû efendî
Jin û mêr tev diçûn kar
Karê tevan pir dijwar
Palevan û gêrevan
Tevan pembû avdidin
Şivên rezan didinhev
Herdû alî weke hev
Kebanîya xweşmirês
Dolabrês û teşîrês
Kevanjen û tevinker
Destevala diçû şer
Derb û ber û av û nan
Dibir ji bo ê şervan
Hem nanpêj û riştebir
Karê malê tev dikir
Lê dar bi destê mêr bû
Li ser jinê çi şêr bû !

Li vî gundî mezin bûm
Ez biçûkî wek cin bûm
        Sêzde salî derketim
        Bi ber bayê xwe ketim
Ji ber axê û Gerebêt
Ev gund nema bi kêr têt
        Bavê min bû wilo got
        Em derketin cot bi cot
Dil tijî bû ji derda
Ko me gundê xwe berda
        Çûn cem Osmanê Temo
        Paşê çûn Bêdermemo
Biner çib serê me hat
Sibeh zû nû, Rojhilat
        Hate ser me Gerebêt
        Ji dev diçin ar û pêt
Bi candirme, zirte-zirt
Bi ser me de sibê girt
        Lê xelkê gund wek mêra
        Em veşartin wek şêra
Ew serkarê dîn û har
Çi anî serê *muxtar*
        Ji bo me pir li wî dan
        Lê em nedan destê wan
Candirme ko siwar bûn
Hê ji nû em şiyar bûn

Vegeriyan, hatin gund
Lê dixwênin bûm û kund
Birçîbûn û giranî
Heçî nedî, nizanî
Nexweşî û birçîbûn
Derketin û bêcîbûn
Giranî yek pir dijwar
Xelkê goştê keran xwar
Şerê giran kete jor
Dijmin welat girt bi zor
Du milyon kurdên bêçar
Bi ser me de hatin xwar
Birçîbûn û nexweşîn
Di nav me de dimeşîn
Bi vê êşê mirin pir
Mêrê xuşka mijî mir
Bavê min çû Amûdê
Tenê mane, ez û dê
Birayê min çûbû şer
Li hinda Balîkeser
Lê raborîn meh û sal
Şevek revî hate mal
Tev rizî û perîşan
Dey li me kir: kanî nan ?
Ew kesê ko direvî
Nema karî derkevî

Ew jî me şand Amûdê
Dîsa mane ez û dê
Zivistan çû, hat bihar
Ez û wê jî hatin xwar
Lê çawa borî sibat
Hala mezin li pey hat
Bavê min jî bi wê çû
Nexweş ket û ranebû
Em diçûne ser xetê
Dibûn palên dewletê
Tirên, dibirne Mûsil
Dixebitîn em ji dil
Paşê ji Amûdê çûn
Bêdermemo me kir şûn
Bûne pêwanên reza
Ji nû ketin nav diza
Diya mina kevnejin
Tevinker û kevanjen
Dilovan û bîrewer
Ev jîn pêre neçû ser
Diya ji min hezdikir
Nexweş ket û li wê mir
Çawa tê ber çavê min
Agir tê hinavê min
Mele Xelîl jin anî
Li min bû bargiranî

Di wê çaxê, wê mehê
Vegerîyam cem xwehê
Nazdar û efendî bûm
Yanî quranxwendî bûm
Lê wê ez kirim şivan
Tenê ji bo kinc û nan
Heta salên min bûn bîst
Hiş û mijî ji nû lîst ;
Çiman ez dibim şivan ?
Çima nabim xwendevan ?
Ji nû çûme xwendinê
Min çav berdan vê dinê
Melayê Hazda banî
Bîst û heşta jin anî
Lê min hespê xwe bezand
Ta şihada xwe sitand
Hingî derbas dibû jîn
Serpêhatî me pir dîn
Şer û şewat û kuştin
Dil û ciger dimiştin
Ji sala bîst û çara
Ketim rêza hişyara
Ji bo jîn û felatê
Ketim nav kêferatê
Ji çîroka Mem û Zîn
Navê xwe kir Cigerxwîn

## NEZANÎ BARGIRANÎ

Ez û tu kîne ?
Çine ev newal û şax ?
Hebûn û nebûn çine ?
Çine ev av û ev ax ?
Valabûn, dagirtin çine ?
Çine ev ger û sitêr ?
Bîrewer û hirç û hov,
Hişkeber û hişkewer û sax ?
Hin dipeqizin û dixwazin jîn
Û hin diherivin bê tevger
Gerok bê armanc û hov
Nizanim çawa diçin tên
Raste, ko em mîkrobin, lê;
Ew çine, kî zanî, kî ?
Dawî li kûye, nizanim ez
Emê herin kû bêje, ey dûrbîn !
Di ser wan ve diborin em
Hemî, çi kevn û çi nû
Kî zanî çi hat û kî zanî,
Kî zanî çi çû ?
Hebûneke bêser û bêdawî
Gavan tavejin û pêşve
Diçin ez û ew û tû
Ji kû gihane me ka bêje ka ?

Ev evîn, ev jîn, ev dîdar ?
Ev cihan, tev gêj lê em
Tenê têde bûn hişyar
Kê daye me ev zanîn û vîn,
Û jîn û serbestî, nizanim ?
Bi kuve diçin ev candar gelo ?
Mikrob, gerok tev jîndar
Ev cihan bi carek tevger
Û seranser tarî reş
Ev sitêr ronî didin me
Û ez û tu pir dilxweş
Em hemî hevdî dixun
Û diser hev re diborin
Hin bi me pir xweş
Û em bi hinan xweş
Ez û tu hev dixwazin
Ka çiye ev xwestin ?
Hin ji me serbest û
Hin ji me bindestin
Rista ko ez û tu têde
Bi hevre azad em çê bûn
Newek hev anîne lê
Em nêr û mê derxistin
Eger xwedê hebûna,
Ez û tu dibûn ew xwedê
Efsane û çîrok pirin

Bicarek guh medê, guh medê !..
Em tev bê ser û şo û bê bin
Hêj kes ji me neghaye ser sedê
Lotan didin xwe bicarek tev
Ev bîrewer, jîndar, cenawer
Mê pingava jîne lê nêr
Kanîya jîne, bingeh û jêder
Lê ji kû hatine em hemî
Wê herin ku, kî zanî ?
Ne pêşî heye û ne paşî
Jîneke bê ser û bê bin û bê ber

## JIN HENE JINKOK HENE

Cihan bûye zivistan
Rê û biwar rawestan
        Berf û baran û bahoz
        Hawîr bûye terpetoz
Çûk nikarin derkevin
Teba nema dilivin
        Rê winda kir çîqê reş
        Di wê roja pir nexweş
Cihan li ber tarî bû
Ew nizanî diçî kû
        Bi bez diçî, dil bi kul
        Per û terî hemî şil
Ji ber serma Sibatê
Xwe avête ber latê
        Pir tarîye, bû dereng
        Dî şikeftek reş û teng
Çîqê reşê pir bi rû
Xwe avête hindirû
        Ket hêlîna kevokê
        Xwe berdaye ser çokê
- Kevokê kir qire-qir
Pepû, ji ku hatî vir ?
        - Ba, bahoz tên bi gij-gij
        Cihan tevde bûye mij

Ez hatime mala te
Xwe daye ber pala te
        Ejî wekî te teba
        Gerek bêjî: *merheba*
Van çend rojan Sibate
Tim namênim li ba te
        Ezê herim mala xwe
        Bighêm cem hevala xwe
Lê kevokê bi xeyd go:
Na heyra, na, de o, to !
        Îşev raze, sibê zû
        Here bêka diçî kû ?
Ez bi tenê jina bî
Hêlîn tenge, nîne cî
        Nêr hemî dest dirêjin
        Xelkê siba çi bêjin ?
Dost û mirov û neyar
Wê bê: bûne dost û yar
        Ne wek hevin per û post
        Em nikarin bibin dost
Lê çîq per gihandin per
Hinek bala xwe da ser ;
        Bi evînî jêre got:
        Heta dil û ciger sot
Ejî wek te xwedî per
Zivistane, bê mefer

Heçî mê ne, dilovan
Ez li te bûme mêvan

Ey kevoka cowan per !
Kî mêvana dikî der ?

Bere bişkî bayê reş
Belkî cihan bibî xweş

Navêm li cem te razim
Xatir ji te dixwazim

Ezê herim mala xwe
Herim cem hevala xwe

Çawa laşê wê germ bû
Dilê wê pêre nerm bû

Ezê bêjim guh bidê
Mêvan mêvanê xwedê

Lê berê xwe mede min
Çawa hebî qelse jin

Hinek dûrî min here
Berê xwe jî bighere

Oh, de çine evên nêr ?
Li ser me xwe dikin şêr

Heçî mêrin tolazin
Li pey jinan dibazin

Ev şikefta me wek dêr
Ez paqijim weke zêr

Gotin çend gotinên tewş
Bi herdiwan xweş bû rewş

Çîqê reşê bê fedî
Ji nû riya xwe tê dî
        Perên xwe berdane ser
        Wî kişandin çend keser
Go: şêrînî, kevokî
Xuyadikî zarokî
        Ev cihana pir mezin
        ne serî û nejî bin
Mişte ji evîn û jîn
Hebûn çiye, bê evîn ?
        Jin çiye ko nebî mêr,
        Ko xerc ne bî çiye zêr ?
Rewşa jînê mêr û jin
Herdû hevdî dimijin
        Em ronîya vê jînê
        Sazin ji bo evînê
Mêr û jin ko bighên hev
Li dil ronî dibî şev
        Bihîstine *Mem û Zîn*
        Kîne *Ferhad û Şêrîn ?*
Eger nasnakî evîn
*Xec û Siyamed* bixwîn
        Ew qas li min mebe leç
        Bixwîne ka çilo Xec ?
Dil ji kul û xeman mişt
Di evînê wê xwe kuşt

Ez Memê me û tu Zîn
Ez Ferhad û tu Şêrîn
Ez Siyamed tu jî Xec
Çi jinbî û çi jî keç
Ey kevoka per heşîn
Heçî nêrin, Ciger-xwîn
Mêr çiyakî pir paqij
Lê jin li ser bûye mij
Ez ne dînim, ne gêjim
Bi kurmancî dibêjim :
Sergo nadin ser bana
Jin guh nadin mêvana,
Ev pirtikên xweş û nerm
Ku nekşênin hilma germ
Çi hêjaye jîna te
Ko nekşênim bîna te
Siba wê bibî bihar
Teba dibin dîn û har
Serxweş dibin ker û gur
Bi zûr-zûr û bi zir-zir
Bi wan xweş bin dem û çax
Hawîr dikin ox û ax
Bi wan şêrîn dibî jîn
Dilan dadigrî evîn
Pey hev kevin jin û mêr
Yan jî heçî mê û nêr

Tilûr bikin qişte-qişt
Laş ji evîn dibî mişt
        Çiqas paqij bî wek zêr
        Mê nîne dil nedî nêr
Gerek hebî hespê nêr
Çavên te jê bibin têr
        Perên xwe têxin nav hev
        Çi bi roj û çi bi şev
Ji hev bistênin germê
Ji xwe bavêjîn şermê
        Xwe têxî ber dilê wî
        Birevênî kulê wî
Bi we pir xweş bibî jîn
Tijî bibin ji evîn
        Ejî nêrim, tijî mê
        Serma me kuşt bi germê
Emê hevdî kedîkin
Çêlîkên xwe xwedî kin
        Ew kevoka jinebî
        Zû fireh kir jêre cî
Çeng û per lê şikestin
Herdû bi hevre mestin
        Kete nav lingan terî
        Dibin çavan lê nêrî
Pê xweş bûye gelek jîn
Dil dagirtî ji evîn

Cihan pir pê bûye xweş
Xwe siparde çîqê reş
Piştî ko roj çû ava
Ew bûne bûk û zava
Derbas bûn ew demên sar
Sibat çû û bû bihar
Gul û kulîlk çûne der
Cihan bûye kesk û zer
Her kes rûgeş bi jînê
Dilbijokên evînê
Teba hawîr digerin
Tilûr bilind difirin
Candar hemî bi şadî
Divên gerdanazadî
Çîq û kevok bûne cot
Wek destûra xwedê got
Geh bi roj û geh bi şev
Dane hevdî lêv û dev
Ji nişka ve dîn rokê
Qolinc hatin kevokê
Hêkên wê ku bûne heşt
Ji nû li ser wa rûnişt
Bi ser wan de bû pisîk
Heta ko bûne çêlîk
Lê dî ko reşin wek çîq
Ji nû kire şîqe-şîq

Kire gazî go: hewar !
Firî jor û hate xwar
Kire qîr û şîqe-şîq
Xwe avête riwê çîq
Çîq serê jêre danî
Kevok dîsa çû banî
Dîsa bi hêrz hate xwar
Reben, ji ber qare-qar
Çend êrîş anîne ser
Li wê navê xweş bû şer
Çîq jêre go: diya min,
Çiye kêmasîya min ?
Go: ey çîqê reş û pîs
Te wêran kir li min lîs
Ez paqij bûm weke zêr
Te ji banî anim jêr
Min nav nanîbûn ser xwe
De wer rêkê jê derxe
Ezê çi bêjim xelkê ?
Wê nebêjin: te ji kê ?
Wergirtine ev çêlîk
Ne pîroz bî ew kêlîk,
Ko, tu hatî mala min
Xwe avête tala min
Bi vî serê tey mezin
Ez jitere nabim jin

Çîqê qurpiz go: tifî
Bê li bextê jina bî
Ma kes karî li dinê,
Bi zor bazdî ser jinê ?
Bi te ez bûbûm şekir
Îro dibêjî: *siktir !*
- Ez kevokim per sipî
Keç bim yan jî jinebî
Ez paqij bûm weke zêr
Ez neghame kesê nêr
Ji bazî re nego: fîq
Çawa bibim jina çîq ?
Bixwe ket û kir hewar
Çêlîk tev avêtin xwar
Ji nû rabûn hêrzên çîq
Bi ser de kir şîqe-şîq
Êrîş birê bi nikil
Lê pir kirin xem û kul
Bi xeyd ji kevokê re got:
Te hinavê mi tev sot
Ey kevoka jinebî !
Tilûr çi reş, çi sipî
Hemî ji yek bavî ne
Meger bej û avî ne
Sipî û reş û belek
Di jînê de hemî yek

Şaşa mela û keşe
Yek sipîye, yek reşe
        Lê herdû jî olperest
        Xwedî destûr, xwedî rist
Mî ya sipî, mî ya qer
Weha renge ga û ker ...
        Şeb sipî ye, reşe misk
        Berf sipî ye reşin bisk
Roj sipî ye reşe şev
Reş û sipî weke hev
        Rengê teba hezarin
        Bê pîvan û jimarin
Kesk û sipî, sor û zer
Li jor dibin qozeqer
        Em tev ji vê axê ne
        Xwej min çêtir mebên e
Kevokê go: çîqê reş
Pir çilekî wek keleş
        Reş û sipî ne wek hev
        Kengî roj dibî wek şev ?
Reşik tev bê ewle ne
Li ber destan kole ne
        Tên kirîn û firotin
        Weke êzing û rotin
Çîq go: na, na, tu şaşî
Di vir de pir li paşî ;

Reşin hene serbestin
Sipî gelek bindestin
Lê tev karker û cotar
Dibin kolê koledar
Mirov hemî weke hev
Tevlî candar dibin tev
Candar hemî xwarinxwer
Hinek hene bîrewer
Mirov xwedî zimanin
Ji me çêtir dizanin
Pêş ve diçin dem bi dem
Li paş mane tenê em
Kevokê go: bese, bes !
Şikeft li min bû *qefes*
Dev ji felsefê berde
Te naxwazim mi berde
Çîq go: kevoka sipî
Evin weynê jinên bî
Reş paxerin, sipî, zêr
Niha bûne jin û mêr
Eger qanûnek hebê ;
Divê tu pey min de bê
Jin tim darê şikestî
Jêre nîne serbestî
Go: bi serê tey mezin
Ez ji te re nabim jin

Jehrê têxim vî dilî
Ezê li te kim gilî
        Herdû firîn çûn ezman
        Çûn dîwana Suleyman
Çîrok li civatê got
Dilê tevan kir bizot
        Lê wezîrê wî yê kurd
        Go: ey şah û Yezdîgurd !
Bere herdû bifirin
Emê li wan binerin
        Ka raste herdû wek hev
        Raste ro jî weke şev
Herdû rabûn xweş firîn
Li ezmana xweş gerîn
        Çîqreş dema hate xwar
        Xwe avête ber dîwar
Lê kevok hat ji ezman
Çû ser destê Suleyman
        Wezîr gotê: ezbenî,
        Ezê bêjim, ne kenî :
Herdû ne babetên hev
Ro jî nabî wekî şev
        Çîqê reşê kesnedî
        Ne wek kevoka kedî
Ev kevoka dilovan
Tê ser destê Suleyman

Nej bo reş û sipîtî
Ji bo hovî, kedîtî
Jêre navê xeberdan
Kevok jê hate berdan
Çîq gote mîrê cina
Guh mede weynê jina !
Li nik çîqê teyê reş
Çîrokek heye pir xweş ;
Ferman bike bibêjim,
Da zanibî ne gêjim
Ne kin û ne dirêje
Suleyman go: de bêje !
Go: xortekî ser bilind
Keçek anî wî ji gund
Ro çû ava, bûye şev
Bûk û zava gihan hev
Berî herdû bibin cot
Wan ev ji hevdî re got :
Jêre da sozek mezin
Ez dest nadim jinek din
Xwedê çêkir jinik mir
Gorna wê li pala gir
Mêrik li ser wê girî
Lê wê çi bêjin mirî ?
Eger salek, eger do ;
Xwedê ji Cibrîl re go:

Rabe here vê şevê
Biner ji min çi divê !
Cibrîl sivik hate bal
Te çi divê ey heval !
Ger te divê zîna xwe
Bidê nîvê jîna xwe
Ezê ji bo te rakim
Dilê te û wê şakim
Mêrik pêre çû rayê
Nîvê jîna xwe dayê
Deng hat ji gornistana
Cibrîl rabû ezmana
Mêrik dicî de bû kal
Jinik rabû wek xezal
Kalê reben berde çû
Lê ew dûrî wî dibû
- Pitê, ez mêrê te me
Li ser wê soza xwe me
Bû tiq-tiqa wê, kenî
Go: bes kalê dev genî !
Ez a gewra çav xezal
Çawa bikim evê kal !?
Kalê reben, bê mefer
Wî êrîşek bire ser
Li wê navê bû hewar
Ji wêde hat yek siwar

Lê xortekî gelek rind
Bejn û bala wî bilind
Dest avête destê wê
Avêt ser pişta hespê
Siwar jinik bir û çû
Kalê, tifek daye rû
Cibrîl hate serê gir
Weke berê dey lê kir
Ha, ka jina te ya baş
Xwedê şaşe, yan tu şaş
Go: ez kolakî ser reş
Xwedê çibkî ewa xweş ?
Cibrîl gotê: kalê dîn
Jîna xwe jê tu bistîn
Mêrik dîsa wilo got
Dî ko dîsa bûye xort :
Ey padîşahê ser text !
Li cem jina nîne bext
Dil bi kul û bi derdim
Çawa jina xwe berdim ?
Bersiv dayê zû kevok
Hin jin hene, hin jinkok
Destûr bide kevokê
Ejî bêjim çîrokê :
Hebû keçek gewr û rind
Bûbû çîrok li nav gund

Xortek rabû dest bi dest
Qelen da û keçik xwest
        Piştî ko roj çû ava
        Gihanhev bûk û zava
Herdiwa sûnda mezin xwar
Ji kesî re nabin yar
        Li wan demên pir dirêj
        Derbas bûne bê sergêj
Mêrik rojekê bi lez
Berê xwe da nava rez
        Tiving li ser milê wî
        Tiştek kete dilê wî
Ka ez wê bixapênim
Da rastiyê bibênim
        Tebak li wê çolê kuşt
        Derpê di xwînê de hişt
Nava lingan kire xwîn
Hate malê dil bi şîn
        Çawa jina wî ew dî
        Kire qêrîn, da girî
Mêrik kete nav ciya
Jinik rûnişt ber piya
        Go: ka bêje çi bûye,
        Birîn çiye, li kûye ?
Go: min yeke neçê kir
Min tebakê xwe jêkir

Jina wî ya pir ciwan
Jêre wê got: dilovan ,
Li ser soza xwe me ez
Tu kes naçî li nav rez
Jinik kete gomana
Weke tavên barana
Sed dihat û sed diçûn
Çawa çêkim ewlebûn ?
Ewlebûnê ku çêkim
Divê pozê xwe jêkim
Rabû çû odake dî
Wê gûzanek li wir dî
Pozê xwe wê zû birî
Zor da hewar û girî
Mêrik sivik rabû, çû
Li ser qadê dî kepû
- Pitê, min derew dikir
Go: te ya xwe bi mi kir
Wî pozekî sade zêr
Çêkir mane jin û mêr
Guh mede vî çîqêreş
Çîroka mij te ra xweş
Ji civatê re go: mîr,
Ev wezîrê mi pir jîr
Go: bi serê bavê min
Hew tu jêre dibî jin

## MELA YÛSIVÊ HESARÎ

Mela Yûsiv Hesarî bû
Gelek jîr û şiyarî bû
Dema êrîş dikir yekî
Wek agir û dijwarî bû
Wezîrê axayê me bû
Axa li wî pir ewle bû
Herkes diçûn ber dest û pê
Hêvî di wî de pir hebû
Dijûn didan xelkê bi tov
Wî tim digo: ey hirç û hov !
Dengê xwe nakin, bûne tat
Win sêsed û ew yek mirov
Dema axa derket ji gund
Hate Cizîrê serbilind
Wî pir mirov, diz û çilek
Li xwe civandin bûne lek
Herdem diçûn nava welêt
Li gund dibarand ar û pêt
Kurtêlxwerên wî tim li pey
Tev xwînmij û dijwar û şêt
Talan û sed bêş û bela
Li gund dikir sed teşqela
Gundî bi qêrîn û hewar
Bi wan re hevpar bû mela

Serdarekî turk û neyar
Dihate nav wan car bi car
        Gilyê Mela Yûsiv kirin
        Gotin: melê malê me xwar
Hevalê axê derketî
Nan dayê herçî binxetî
        Ew bûye altaxê çetan
        Herçî ji turkan dûrketî
Ferman bi kuştin daye wî
Jêre nemane şûn û cî
        Ew birne *Eynkafê* sivik
        Dema ku serdar lê nerî
Kut-kut kete dilê melê,
Çawa bikevme vê belê ?
        Çare nemaye, kuştine,
        Kê xistime vê teşqelê ?
Cibê dirêj û rîş û şaş
Xeftanekî sade qumaş
        Bi qûndera kabik bilind
        Sivik revandin ew ji gund
Ev gotinin, seyda dibê
Leşker birim cem, lê sibê
        Quran me derxist, daye pêş
        Sed sûnd me xwar bê firk û bêş
Quran ji dest min girt û go :
Bawer bi vê nakim, kero !

Ew zorkerê pir har û xurt
Bi ser me de kir zirte-zirt.
Quran çirand û perçe kir
Avête ber pê hûr û gir
Lê wî bi tirkî go: bibin !
Ez dame ber xwe *pezk û gur*
Min dî ku hêvî maye hêj
Min gote çawîş jêre bêj :
Kurkê mine li mektebê
Hêvî dikim bişênî pê
Çawîş dema ev jêre got
Yek rêkire mekteb bi lot
Çawa kurik anîn mi dî
Hêstir me berandin bi cot
Kengî kurik hat, pate da
Destê wî girt û berneda
Go: raste ev bavê te ye ?
Çawa wî destûra te da ?
Axa ku çûye binxetê
Bûye neyarê dewletê
Çawa dibî dostê neyar ?
Çawa wilo qîma te tê ?
Lawik kenî, go: ez xulam,
Gundî, dizanî şîrheram
Bavê mi pir zana û jîr
Tim alîkarê bêqiram.

Serdar ji min re go: veger !
Dûrî herin, ka virde wer !
Te ev kurik şand mektebê ?
Niha tu azad bû, de her !
Ne cibe û ne rîş û şaş,
Tev xwendina min çûn belaş.
Herçî dibêjî raste ew
Ê şaş emin, neko tu şaş
Çend sale ko min xwend û xwend
Çend sal me ders gotin li gund
Quran û şaş, karek nekir
Mekteb ji bo min bûye find
Şêxên ko wek Ebû-Bekir
Li cem me kurdan wek şekir
Yekî li ber sêdar û ben
Keşf û keramet çênekir
Herçî digotin tev derew
Min guh dida pirsên qelew
Hemî nezan û bîrnebir
Hişyar nebûn ne ez, ne ew.
Tu rast dibêjî ey bira
Şêx û mela rengê gura
Bibêje, binvîs aferîn !
Ez hew dibêjim: gawira

Şêx û mela tev hov û dîn
Wan xistiye destê xwe dîn
        Barê me îro bû giran
        Cerg û hinav tev bûne xwîn.

## DILGIRTINA KORA

Kor bû Mihemed Heso
Dil ket Helîma Reso
Dema dighane cem hev
Roj li cem wan dibû şev
Dest dibir ser miwê wê
Diçû çav û riwê wê
Hevdî dikirne hembêz
Dev û rû tev dibûn mêz
Laşê wan tev dihejî
Dil ji evînê tijî
Pêjinker bûn bi guhê xwe
Zû diguhaztin cihê xwe
Mihemed qalûnkêş bû
Herdem qalûn li pêş bû
Wî xweş dikşand bi kuş-kuş
Dixan li ser dibû mij
Med go: Mihemed Heso
Dil ket Helîma Reso ...
Wî nasnedkir navê me
Dijûn didan bavê me
Dar tavête nigê me
Carna diket zikê me
Xort û qîz bûn lê ciwan
Em zaro bûn, pir nezan

Med go: çima roj û şev
Ev herdû kor dighên hev ?
        Evîna wan xweş û rind
        Bûbû çîrok li nav gund
Herkes bi wan dikenî
Lê, ne raste, ez benî,
        Kor jî weke me mirov
        Heta weke hirç û hov
Xwedî dil û tijî vîn
Ew jî dilbijên evîn
        Evîn timî wek are
        Lê ya koran dijware
Kor bi koran tim kedî
Bê fehêt û bê fedî
        Hevdî digrin, bernadin
        Kes nabênin, azadin
Ne şerm heye, ne fedî
Karê wan zû naqedî
        Hevdî digrin, digvêşin
        Weke mêş û derwêşin
Li nav bexçe dimênin
Korin, kesî nabênin
        Dixwazin bibne yek laş
        Zû xwe ji hev nadin paş
Bi dil herdû dibin yek
Meger di kincan de tek

Evîn di wan de xurte
Na, ez şaşim, pir sirte
Dil bi ronî wek rojin
Rojê bi dil disojin
Ne bi mal û cah û zêr
Herdû ji hev nabin têr
Ew jî wek me mirovin
Bi dilgirtin wek hovin
Wek dibêjî Cigerxwîn :
Cihan mişte ji evîn.

## CIZÎRÎ RABE MEYZÊNE

Mela rabe, evîna te
Giha ber rendeşa zanîn
    We, rê winda û şev tarî
    Çi Geylanî çi Şîrazî
Serî hilde binêr çawa
Gihane jorê ezmana
    Me gewher perçe kir îro
    Bi zanîn û serefrazî
Li ser heyva wekî birhên
Şepala te, dikin geştê
    Di baxê gulşena dilber
    Diçin, tên em bi şehnazî
Xwedê kanî, li kûye ew ?
Supahê *lem terew* îro
    Gelo qey pîr û bê havil
    Dinav *Laşey* û hevrazî
Hezar salî qelender bî
Tu naçî ber derê dilber
    Ku şehnaza ciwan û rind
    Mirovên wek te naxwazî
Cizîrî rabe meyzêne
Cizîr çawa perîşane

Hemî milet gihan dozê
Bi gernasî, bi şûrbazî
Bi tîrê tore dur siftin
Gulên baxê te pişkiftin
Divêm ez we ji xew rakim
Bi qêrîn û bi devsazî ...
Tu zanî ez Ciger-xwînim
Ne dost û dijminê dînim
Gelo kî dighê daxwazê
Bi derwêşî, bi gaz-gazî ?

## KA KEVN NADÊRIN

Bavê te gelek ji me kuştine
Wey bêbext, bêbext, bêbext !
Malbata me û we li ber hevin
Bi tiving û şûr û dar û rext

Dijminahiya me dijmin kire axa
Ma nebese, ta kengî wilo bin !?
Ji dest me derxistine ew tac
Û can û mal û dar û text

Serê xwe li min dihejênî ;
Yanî gunehkarim ez
Berê xwe ji min diguhêzî ;
Yanî gunahkarim ez
Were em ka kevin nedêrin !
Û guh nedin heçî çû
Bextiyarî çavnêrî me ye
Ko bê pir bextiyarim ez

Ji bavê tere çi hatiye gotin
Bê bextîne, bê bextîne tev
Ji diya tere çi hatiye gotin
Dırûtine, durûtîne tev
Cobarên bê bexte li gundê me û we
Dibin wek derya ko tev bighên hev

## REBENNAME

Heval, Cemîlê pir Cemîl !
Xebat bike wek şêr û fîl
Tu guh mede sed *qal û qîl*
Ji dil bike qîr û hewar

Rû tev xurî, çavê te kor
Ronî te daye tor û zor
Dengê te çûye ber bi jor
Dil paqije, pir qence kar

Bike hewar û sed eman
Bibêje wan kurdên nezan
Win dar medin pîs û dizan
Sitûr mekin li ser xwe dar

Turk û neyar tev hevrikin
Niha şerê Qibris dikin
Paşê dizanin wê çikin ?
Li ser pişta me bin siwar

Bike hewar û nalenal
Gazî bike kurdên *şimal*
Yekser bibin dost û heval
Va çûçika genmê we xwar

Gazîke nevyên Mîdîya
Bes xwe bikin rengê miya
Derkevne ser şax û çiya
        Ji we ditirsin tim neyar

Ta kengî wer razin di xew ?
Li ber neyaran çêlekew
Îdî mirin nêzîke lew
        Divêm ji xew rabin şiyar

Dostê neyarin, dewlemend
Êko bi dest wan mal û gund
Parsek ji nû bûn serbilind
        Hişyar dibin em bêjimar

Milet emin, xwedyê welat
Divê ku em rabin xebat
Pakij bikin tev Rojhilat
        Ji xap û rîpên koledar

Van şêx û paşayên nezan
Em xistine destê dizan
Heval, tu vê ji min bizan
        Tirba sipî û dûvê mar

Ev Turk û Faris , yan hemî
Xwîna me mêtin wan timî
Korin, nizanin ev gemî
        Kûve diçî, kî lê suwar ?

Roja me jî nêzîke, tê
Dernakevin ji vê xetê
Bigrin bi dest xwe dewletê
        Ko çû zivistan, tê bihar

Bihar bi me pir xweş dibî
Her kes bi wê rûgeş dibî
Riwê neyaran reş dibî
        Serê xwe ranakin tu car

Dijmin dibin lingan kevî
Rev jî bi destan nakevî
Bo me dimênî ev zevî
        Têde dijîn em payedar

Têde bijîn em tev bira
Xwendin bibî rengê çira
Winda bikin em va gura
        Bi perçiqênin rengê mar

Milet hemî girbêj bikin
Toz û gemarê rêj bikin
Jîna welat dirêj bikin
        Pêş de herin ezman û zar

Em zorê bidne xwendinê
Pir xweş bikin em vê dinê
Serbestî bidne dest jinê
        Îdî nemênin zarezar

Divê ku jin azad bibî
Wekî me ew dilşad bibî
Perda serî berbad bibî
        Wê pir ji me tehlî vexwar

Tehlî herî, şêrîn vexwî
Lê xwe ji rê pir dernexî
Ji vî rexî, ji wî rexî
        Divêm bibin bi pişk û par

Jin mêweke şêrîn bere
Dara evîne, tim tere
Sedef ewe, kur gewhere
        Sîng bexçeye ew gulîzar

Heval Cemîl, hêvî û lav
Bighê hevalan sed silav
Ûsvê letîfê ew bi nav
        Li kû dikî geşt û guzar ?

Reben hemî dostê me ne
Çibkim ji me, bê lome ne
Çavnêrî vê benda me ne
        Qada me pir maye beyar

Kor û kulek û bawîya
Mest û hejar û tawîya
Heta bi tat û şawîya
        Wan dil ji vê jîna me sar

Heval û hemyarê me ne
Çavnêrê vî karê me ne
Herdem jî guhdarê me ne
        Hemî belengaz û hejar

Hemî belengaz em yekin
Ji hevketî ne, bê çekin
Dijmin dixwazî deynekin
        Di nav me danîn dilgemar

Em tev birane narevin
Xurtin, ji hevdî nakevin
Em kareva ne ew şevin
Qewam li kuye, ka beyar ?

Ew tevde çûn ber av û av
Heta bi lêvan bûn çirav
Maye ji wan yek pîsenav
Milet sitûre wek zinar

Ka Qeyser û Ebdil Hemid ?
Ka Feysel û sultan-Wehîd ?
Kanî Rizaxan û Mecîd ?
Ka Xusriwê Zêrî Guhar ?

Ew pêkve çûn, milet heye
Wî guh li vî dengê me ye
Herçî dibêjin jêre ye
Ziyan ji bo me, jêre kar

Çend sale em bi qîr û lew
Dey lê dikin: rabe ji xew !
Dijmin bibî wek çêlekew
Bimrin sehên devlok û har

Da bêne kuştin ên nebaş
Ew zorkerên wek gornepaş
Em aş bidin destê qeraş
        Da rast bikin herçî ku xwar

Da xwarîya em rast bikin
Qenc û neqencan nas bikin
Milet ji wan xelas bikin
        Qadê leva kin pişk û par

Qadê li hevdî par bikin
Pêkve bi hev re kar bikin
Ên çav li xew şiyar bikin
        Da kes nebê: xwezî bi par

Pir xweş bibin hebûn û jîn
Pêkve bi dilşadî bijîn
Îdî Ciger nabî bi Xwîn
        Bes em dikin qîr û hewar.

## DİNNAME

Miradê min tiwî herdem Mirado !
Di bîra min tu hatî ey bira, do

Li nik min pir şirîn û dost û yarî
Tijî wek min perîşan û hejarî

Li cem Simsim bi hev re rûdiniştin
Xem û derd û kulên xwe me di kuştin

Selavê min li te ey lêv ji hingiv
Mehol û mêş li hawîr te bi giv, giv

Selavê min tu xweş bighêne Simsim
Tu ramîse muradê min guh û sim

Selavên gulgulî bighêne Şikro
Li Simo û li Îsa û li Nesro

Ji bo we ez gelek dost û hevalim
Ji ber derdê we her şev ah û nalim

Çi tiştên win dibêjin zêr û gewher
Nikarim wan bixwênim ez ji ezber

Hevalên me pirin lê tev belavin
Li deşta û li şaxa û peravin

Eger hevdî bibênin, dibne *dewlet*
Xwedî tac û sera û al û *şewket*

Dipirsim ez li ehwalê Emûsê
Gelo karî xwedîkî xwe bi pûrsê ?

Silê çawa didî qehwa xwe ya tal ?
Şerîfo hê tena xwe ew diçî mal ?

Gelo hêjî Eraqê xweş dinoşî,
Guhanê dewlemendan ew didoşî ?

Dijûnan pir dikî, serxweş dibî ew
Di kasa wî sipî bûye çeqildew

Gelo şikro diran çêkirne, taxim
Li ser soza xwe me heta ku saxim

Xelosîtî xelas bûye ji qeyda
Gelo çidkî digel masûmê Seyda ?

Hevalo, hêj tu boyaxê dikî xweş ?
Xulamê wan diranên tey zer û beş

Heval, bêxem tu raze, xem nebaşin
Tu guh medyê, metirse, em ne şaşin

Cihan şêrîne, kes nîne ku navên
Bi şadî wê divên, dijware bavên

Hebûn, kevne, gelek şêrîne ev jîn
Bi hevre dost û yarin wek Mem û Zîn

Heçî pêde dirî, pêde dirî ew
Ne nagona kese, ma kê kirî ew ?

Ji kes re nabî dost û hemdem û yar
Tu pê bawer mebe heta bi êvar

Birane tev: beg û paşa û parsek
Çira ew xanedan û em bira-seg ?

Ji me ew zanetir bûn, bûne camêr
Wekî kizmik li jor man, em ketin jêr

Eger destên xwe em parsek bidin hev,
Bi destê dijminê me nakevit rev

Dibin em jî xwedî rûmet, xwedî nan
Hewara me, xwedê ye, çûye ezman

Bibin yek dest bi hev re parsek û dîn
Emê zengîn bikin yekser dil û dîn

Me dîn berda û dinya çû ji dest me
Gelo wê em nexwestin, ya nexwest me ?

Dema min xwest, li hawîr kirne qêrîn
Nizanim ko ne ez dînim, ne ew dîn ?

Dinav bircabelek rûnin bi mîrî
Çine ev reng perîşanî, feqîrî ?

Hero em dîn, bi hevre herne baxan
Bikin nêçîr û ravan em li şaxan

Nexweştir bû ji vê pars û boyaxê ?
Çiman destan dirêjkin pêşî axê ?

Mela û şêx û axa jî hevalin
Hemî sîrkin di cejna *kernevalin*

Gelek wek me hene lê em ne nasin
Veşartî ne, dibin şal û kirasin

Hemî dîn û hejar û hov û ehmeq
Wekî Simsim çi simtûj û çi guhleq

Selavê min li wan ke, tev hevalin
Ji derdê vê cihanê em dinalin

Ne em tenha, hemî kes bêhiş û dîn
Ji ber wê ye ku ez bûme Cigerxwîn

Çima ko em niha haştî dixwazin
Ji me maldar û dilkurmî digazin

Dixwazin em timî jar û reben bin
Cihê qerf û tinaz û kêf û ken bin

Mebîne em dibin lingan geya ne
Hevalên me li ser şax û çiya ne

Li hawîr xwendevan û ristevanin
Çi rêzanin, bi her tiştî dizanin

Wekî me jar û har û germ û dînin
Gelek jîrin, dizanin, dûrebînin

Eger destan bi dilpakî bidin hev
Bi dest dijmin qe namênî ji bil rev

Çi bêjim, ko gelek mane di xew da
Ne dijmin bir welatê me, me ew da

Ku çîroka me pir dûr û dirêje
Miradê min, ji dostan re bibêje :

Hezar û nehsed û heftê û çare
Cigerxwîn hê li ser we tim heware.

# BIRÊ EVİNDARİ

## AHI JI DESTÊ DÛRİYÊ

Evîna dil çi bêjim ez ?
Ji te dûrî wekî bence
Heye çil sal di nêva dil
        Çikandin wê lep û pence

Dibênî pîr û kalim ez
Şev û rojan dinalim ez
Şikestî rengê dalim ez
        Di dilde: jan û eşkence

Dizanim ev çi tarixe
Di singêde birin mîxe
Di dilde min çi sor - sîxe ?
        Me jê xwarin du sed rence

Dixum vê renc û vê êşê
Didim vê bac û vê bêşê
Bi wêve bûme wek mêşê
        Ku ev jîna me xweş gence

Were ey şoxe - kurmancê !
Ku zû bighême armancê
Meger ez dil bidim bacê
        Gelek hêja û pir qence

Were ey serwe - bala min !
Şikestî - bisk ji dala min
Were rûdêm bi xala min
        Bi naz û lar û xweş lence

Were carek di sersalê
Binêrim ez li wê balê
Li wan birhên wekû dalê
        Li wan biskên reş û mence

Dizanim ku tu dilsojî
Meger dûrî ji min dojî
Were carek berî rojî
        Ku bê rûnin li nêv kunce

Tu zanî ko ciger xwîne
Ne dîne lê kirim dîne
Ji wan lêvên şirîn bîne
        Şeraba: sêv û etrunce

## GULİ ŞENGÊ

Bejin şoxê, gulî şengê
Li ser sêngê dikin cengê
Sipî-zendê, wekî pengê
        Diran zêr û birincîne

Bi lêv û dev kelacoye
Kevan ebrû perî roye
Şirîn gotin, piling xoye
        Memik sêv û tirincîne

Çi cadûne du çavên reş ?
Çi reng rone du dêmên geş ?
Dema ko tê bi lenc û meş
        Birû reşxwar û zencîne

Serên tilyên piyan sore
Di lingande nehin gore
Bi rist gotin,bi ken tore
        Ji zêr gerden çi gencîne ?

Hemî zêr û belexşanin
Bi ristin ew, zerefşanin
Wekî neqşê derevşanin
        Ji Hindê tên, firincîne

Dur û zencîr û pişkojin
Ji wan sed wek me dilsojin
Diîsin tev wekî rojin
        Bi êş û derd û rencîne

Sipî dêmin bi xalin tim
Du lêvên sor peyalin tim
Ji ber wan em dinalin tim
        Bi sawin ew, çi gurcîne ?

Dema min dît ji bircê tê
Şirîn û rind û gurcê te
Wekî lalê di durcê tê
        Bi lar û naz û lencîne

Şeker lêvê giha ba min
Şirîn û naz û rinda min
Ji lêvan şerbetek da min
        Dev û lêv sore, xuncîne

Ji ber wê şerbeta camê
Ji şewqa wê qed û qamê
Veda dil şewq û ilhamê
        Ji wan zulfên di mencîne

Li ser enyê zulif çînçîn
Li min can û ceger kir xwîn
Bi çavan daye min mizgîn
        Metirse! ev ji qencîne.

## EZ Û YAR

Çavbeleka min tiwî
Por xeleka min tiwî
Surmeleka min tiwî
        Lê dil bi kovan ezim

Surperiya min tiwî
Dêm zeriya min tiwî
Şengebiya min tiwî
        Jar û perîşan ezim

Bejin bilindê tiwî
Pir gewr û rindê tiwî
Wek mûm û findê tiwî
        Ê dil bi  sozan ezim

Şox û şepalê tiwî
Qenc û delalê tiwî
Herdem li balê tiwî
        Sermest û heyran ezim

Memik ji sêvan tiwî
Şeker ji lêvan tiwî
Di dilde mêvan tiwî
        Gorî û qurban ezim

Şeng û çelengê tiwî
Awir pilingê tiwî
Ebrû ji yengê tiwî
        Armanc û nîşan ezim

Taca delala tiwî
Şewqa şemala tiwî
Kara xezala tiwî
        Bi qîr û giryan ezim

Gula li baxan tiwî
Pêta çiraxan tiwî
Derdê ne saxan tiwî
        Ê dil bi êşan ezim

Serdarê rinda tiwî
Tilî ji findan tiwî
Ya dêm ji qendan tiwî
        Dil çû bi talan ezim

Gula zinaran tiwî
Gulî ji maran tiwî
Pişkoj ji daran tiwî
        Lê rengê xaran ezim

Nazik û pîroz tiwî
Ji bo me amoz tiwî
Agrî û Zagroz tiwî
        Ronik ji baran ezim

Rû gewr û şêrîn tiwî
Sitêr û Perwîn tiwî
Şêrîn û hem Zîn tiwî
        Memê di zindan ezim

Ya dil birîn kir tiwî
Ciger bi xwîn kir tiwî
Dil har û dîn kir tiwî
        Kuştiyê çavan ezim.

## PESNÊ ŞOXEKÊ

Ey delala şeng û şox û
Pir şirîn û gewr û rind !
Wek keça Mîrê Mila ye
Tim siwar tê ew ji gund
Ez dinalim bê hevalim
Dilbijê bejna bilind
Min ji bona maçekê jê
Danîn liber pê Çîn û Hind
Ey hevalê, wey delalê !
Dilbijê çavên te me
Ez nizanim kê du çavên
Te wilo danîne reş ?
Tîr ji wan çavên direş
Tên dil, hezar û şêst û şeş
Bisk li ser dêman dilîzin
Rû gula pir sor û geş
Ey hevalê dil li balê !
Dilbijê dêmên te me
Dêm wekî sêvên xelatê
Rû sipî û sor û zer
Biskê tarî ta bi ta
Tên semayê xweş li ser
Ah û axîn, sed hewar û
Nal û qêrîn min ji ber

Ey hevalê ebrû dalê !
Dilbijê birhên te me
        Herdû ebrû rengê heyva
        Yekşevî xûz û zirav
Dê li wî cejn û cema bit
Ger bibênî yek bi çav ?
        Rû di bin de rengê roje
        Da cihanê şewq û tav
Poz wekî almas û gewher
Nayê destê kes bi lav
        Ey hevalê,wey şepalê !
        Dilbijê pozê te me
Poz bilinde, gewr û rinde
Rengê mas û gewhere
        Bejn û bala tox û ala
        Dilreva û xwînxwere
Hin dibêjin padîşahe
Hin dibêjin serwere
        Lê çiqasî xwînşirîne
        Dilreva û dilbere
Ey hevalê çav xezalê !
Dilbijê lêvên te me
        Lêv, wekî xuncê gulane
        Kengî tên ken, sor û geş
Aferîn sed aferîn
Maçek ji wan da min çi xweş

Gul ji lêvê dêm ji sêvê
Herdû ebrû xwar û reş
Dil dikî talan bicarek
Ko ji bircê tê bi meş
Ey hevalê sebr û malê !
Dilbijê bejna te me
Bejneka şox û şepale
Rengê serwa ser ciwê
Taceke tev zêr û gewher
Da serê xwe Xusriwê
Min bi sed lav û girînê
Dest gihande zengiwê
Ey hevalê pir delalê !
Dilbijê newqa te me
Newqeka naz û şirîne
Kembera zêrîn diber
Pir delale dêm şemale
Tirhik û nazdar û ter
Mêr û jin tev lê dinêrin
Ko ji bircê tête der
Lê li ser sîngê du sêvin
Reşgulî cengin li ser
Ey hevalê dêm bi xalê !
Dilbijê gulyên te me
Rewş û pergal pir ciwane
Hoste pir xweş danîye

Hin dibêjin: ev Şikakî
Hin dibêjin: Wanî ye
        Yan Melayê Batîye
        Yan jî Melayê Xanî ye
Ey hevalê pir cemalê !
Dilbijê tilyên te me
        Zertilî mûm û şimane
        Lê du gustîl zêr û zîv
Wek sitêran xweş diîsin
Lê li jorê ebrû hîv
        Bazin û zend û tilî
        Gustîl bi hevra bûn kirîv
Ez bi rojî bûm dema
Min dî firavîn kiriye şîv
        Ey hevalê roj û salê !
        Dilbijê çîmên te me
Çîm ji berfa şevnivistî
Ko xunafek lê kirî
        Ser ji gorê radikin
        Sed sed li pêjna wê mirî
Agirek berdaye dil
Hetta ku saxim namirî
        Ah û nal û qîr û hawar
        Min ji ber vî agirî
Ey hevalê tim li balê !
Dilbijê dîna te me

Ez Cigerxwîn bûm li ser te
Ah û nalîn tim girî
Vî giranbarî ne ez bim
Kî dikarî hilgirî ?
Carekê pirsê tu nakî
Qey li kolê ber derî ?
Ev cihan yekser evîne
Lê tu kok û jêderî
Ey hevalê ez di talê !
Rengê ayîna te me

## XWE DERXE

Sibe rabe ji pişt perdê xwe derxe
Tu şê biskan li ser xalên diqerxe

Ji qesrê derkeve xanim bi tenha
Bi lar û lencebe bejna te terxe

Serî deynim tu pêlêke Şehê min !
Vebin carek di ser çavên me erxe

Tu avzêran bi ser singêde berde
Tu zencîran di nav zêrên di zerxe

Li ser singê bila rabit Qiyamet
Birîndarên du çavan bibne kerxe

Bi lêvên sor tu serxweşke me carek
Li hawîr hev bilîzin mak û berxe

Ji wan çavan ber û tîran bibarîn
Dur û yaqût û zêran tev dişerxe

Bihêle bêm tewafa herdû lêvan
Tu destê min di ber qulpa kemerxe

Ji lêvên sor tu maçek ğer bidî min
Li ser min pir biha û pir bi nerxe

Eger raste xwedê-parêsî îro
Tu lêvên min di bin goş û guherxe

Di dilde Şah û Xanî, xanima min
Dixwezî dil bisojî zû xwe derxe

Ciger xwînim di vê rê dilbirîndar
Ji dîdara te wek dolab û çerxe

## MIROVIM EZ NE HOVIM

Li ser textê dilim rûne tu xanim !
Mebîne, ko hemî: ar û duxanim

Tu canê min ji min mestîne canim !
Mirovim ez ne hovim ez ne canim

Weke qesrek bilindim ez ne xanim
Bi şahî wer tu - rûne şah û xanim !

Evîna te dilê min tev disojî
Ji ber "na" te nexoşim - dilgiranim

Ji wan lêvan bi hêvî û xwezîme
Li ber derya evîna te şivanim

Were ronî, mirovim ger tu rûnî
Şeva tarî li min xweşkî ciwanim

Te reşbiskên ji miskê rengê davin
Ji ber wan dil bi qêrîn û emanim

Were bînahiya çavan binêre
Tu dektorî, venêre ez kusanim ?

Du reşmaran dilê xemgîn gezîne
Di jînê ez di nav koma dizanim

Tu şahî,wer bi şahî em bibin dost !
Eger rû wek gula sorî, gulanim

Were xanim li meyxanê duxanim
Li ser herdû rexanim wek Rexanim

Delalê wer şeraba dev binoşim
Ne serxoşim, nexoş û cangiranim

Cigerxûnim, ji "na" te ez dinalim
Şikestîme wekû: dal û kevanim

## SERWE - BEJNÊ

Delal û rind û şêrînê !
Were nik min şeva înê
Wekû Zehra û Perwînê
        Ku xanî têkde gulşen bî

Serû wek bejn û balêye
Birû wek nûn û dalêye
Dilê min tim li balêye
        Were, ko şev bi rewşen bî

Şeva tarî bi min geş bî
Bi bîna te me dilxweş bî
Bila Xanî bi Laleş bî
        Senem, dêm û leb û çen bî

Bibosim ez, dev û lêvan
Herim nav bexçeyê sêvan
Li ser çavên me bî mêvan
        Xelata min ji gerden bî

Eger raste evîndarî ?
Li dengê min tu guhdarî
Were carek bi nazdarî
        Bila xoş û şeker - ken bî

Bila tim ken ji şukker bî
Bila dilxwaz û dil - ter bî
Kewa kesk û kiras zer bî
        Suruşt û hor û bê ten bî

Were da em bibin meynoş
Di xanîde bibin serxoş
Ku em herdu bibin Agoş
Evîna me ne wek fen bî

Xwezî carek bihata vir
Bibosa min çena wek dur
Li dil agir bibûna gur
Bila gerden di nêv ben bî

Were ez te bikim hembêz
Ji wan lêvên şeker - amêz
Şerabê ez vexum hergêz
Ku dil Kesra û Behmen bî

Were ey şah û xanê min !
Tu topan berde canê min
Dema ko bê civanê min
Bila min dil bi londen bî

Bila serbest û azad bin
Bila dilxoş û dilşad bin
Ne wek: Şêrîn û Ferhad bin
Bila navê te: Sewsen bî

Were da ez bibim gorî
Ku ramîsim te ez horî
Ku cengê xweş bikin morî
Bila dil rengê Bêjen bî

Meya lêvan, ku bê xeş bî
Cigerxûn pê bi serxweş bî
Dilê min tev bi ateş bî
        Ku ev ola me nûjen bî

## EZ GIRTİ Û DİLIM

Tîran direşênî
        Tu li dil begler
                Û mîrê !
Dil gazî û qêrîne
        Ji ber gezme
                Û tîre
Sih sale di benda
        Tede ez girtî
                Û dîlim
Guh nadî gilî
        Padîşeh û jîr
                Û wezîrê !

Carek tu li ber
Camê temaşa
Bike birhan
Belkî tu bi saya
Biriwan min
Bixî bîrê
Carek ji serayê
Were zindanê
Me dîlan
Pirsek ji te cana !
Vedikî bendik
Û nîre ?
Ferman bike carek
Ku li dergahê
Te rûnim
Da ser bihejênim
Ji tere ey
Şeh û jîrê !
Seydaye Cigerxûne
Ji derdê te dinalî
Daxwaz çiye zanî
Me ji vê gazî û qîrê ?

## SERMESTÊ EVÎNIM

Ey hevala evîndar
Tu jî wek min birîndar
        Kengî ko em dighên hev
        Bi dilxweşî, roj û şev
Gul û çîçek geş dibin
Dilê daran xweş dibin
        Sunbil hawîr dihejin
        Tev sitêrik dirijin
Çiya bilind dibin jor
Cihan dibit keskesor
        Ba tê bi saz û lîlan
        Terwende hawîr dîlan
Avên gola didin pêl
Riwê rojê dibit sêl
        Tilûr kesk û zer û sor
        Bi bazikan diçin jor
Weke loks û çira geş
Ronî didin şeva reş
        Pir geş dibin gulê min
        Tev direvin kulê min
Gul û çiçêk, ez û tû
Qaz û ordek ez û tû

Herdû rewşa vê jînê
Dengê saza evînê
Ey hevala evîndar
Tujî wek min birîndar
Wer da em herin şoreş
Em guh nedin şeva reş
Bibin wek bûk û zava
Berî roj herî ava
Perda şevê bê ser me
Bext pêwan bî li ber me
Ez têr bibim ji dînê
Pîroz bibim di jînê
Wê hişkedar bibin ter
Em guh nadin ceng û şer
Ev çol hemî dibin gul
Ji dil diçin xem û kul
Gava te bikim hembêz
Bi serbestî herim rêz
Çavên reş û dêm û çen
Herdû lêvên şeker-ken
Bidî seyda diyarî
Li dil dibî biharî
Ey hevala evîndar !
Tu jî wek min birîndar
Ka em herin sînema
Ji dil derxin va xema

Ko çav hawîr bigêrin
Li her tiştî binêrin
        Hene gelek wekî me
        Belkî zêdetir ji me
Herkes divên azadî
Kî naxwazî dilşadî
        Rist û qanûn, girêbend
        Li ber me bûne pêwend
Nahêlin em bijîn xweş
Gayê-beş û kerê-reş
        Ew naxwazin serbestî
        Em jî navên bindestî
Em ronîyên nav şeva
Hev dikşênin-kareva
        Bi çavan hev dinasin
        Çi derpê û kirasin
Bi qozîyên du çavan
Li hev dikin selavan
        Evîndarin, ne tolaz
        Ji hev re bûne dilxwaz
Karê me bê ziyane
Tenê milet, nezane
        Evên bûn rêberê me
        Çi anîne serê me
Dirist nakin evînê
Bêmrês dikin civînê

Lê em biya wan nakin
Divên dilên xwe şakin

Ey hevala evîndar !
Tu jî wek min birîndar
Ka em herin ber çema
Bikin govend û sema

Pêlên avê bibênin
Xeman ji dil derênin
Li ser qûmê em razin
Ne gilî û ne gazin

Dilê me jî pêl bavê
Xwe bighênî peravê
Ew qas teba: gir û hûr
Dijîn tê de bê destûr

Ne mela û ne keşe
Ev jîn bi wan çi xweşe !
Nêr û mê ne, bê jimar
Hemî wek me evîndar

Hinek hevdî dimijin
Hin jî hevdî dikujin
Ev cihana hemî av
Nayên hejmar ên dinav

Hinek têne peravê
Xwe tavêjin ber tavê
Lê em tevan dikujin
Xwîna wan em dimijin

Ko keysa wan li me tê
Nadin kesî firsetê
        Kengî ew me dibênin
        Divên me daqurtênin
Candar hemî wilo ne
Ker û gayê Silo ne
        Tiştên xweş ko dibênin
        Dixwazin daqurtênin
Ev jîna bê ser û bin
Hinek tên û hin diçin
        Wekî me tev nezanin
        Sermest û cangiranin
Em ji ku tên, diçin kû ?
Bersiv nayê dayîn zû
        Dema çêdibin şebeş
        Bi me çiqas dibin xweş
Mirîşk, diçî çi dixwî
Tu jî hêka wê dixwî
        Em tev xwînxwer û xwînmij
        Ma kî heye dilpaqij ?
Em jî weke gur û ker
Tev goştxwer û giyaxwer
        Êrîş dikin derê hev
        Geh bi roj û geh bi şev
Dilên me reş û tarî
Cihan bûye kî karî

Tev pêxwasin wek qedê
Em tev guh nadin xwedê
Tev har û dîn û gêjin
Em nizanin çi bêjin ?
Eger xwedê me rakî
Dojeh têra me nakî
Lê ko vekî *mehkemê*
Ewê herî cehnemê
Tiştê bi me ew dikî
Li ser me derew dikî
Nizanî mejku tînê
Çawa me tînî jînê ?
Ev jîn herdem hebûne
Ne ji *Adem* çêbûne
Jîndar hene her û her
Çi ên hişk û çi ên ter
Weke ava çemê zê
Hinek diçî, hinek tê
Ey hevala evîndar !
Tu jî wek min birîndar
Ka em herin ser çiya
Li ber lat û ser giya
Rûnin ji hev bikin pirs
Çine evên hûr û girs ?
Hin sitûr û hin zirav
Ne dê heye, nejî bav

Ev lat çima wer sitûr ?
Zixur, çima wilo hûr ?
        Dibin me re ava çem
        Berjêr diçî, leme-lem
Ew jî wekî min û tû
Ji ku tên û diçîn kû ?
        Em tev sazin di jînê
        Dilbijokên evînê
Me hevdî kirye hembêz
Di hebûnê bûne cêz
        Sermeyanê me ye jîn
        Kara meye ev evîn
Me perdên reş dirandin
Sênc û çeper çirandin
        Em naxwazin zordestî
        Me tim divê serbestî
Evîn, şerab, qedeh, lêv
Jin bexçe ye tijî sêv
        Derê bexçe veke zû
        Da ramîsim dev û rû
Herdû lêvan bidin hev
Berî li me bibî şev
        Serxweş bibin, bi ken bin
        Wek Menîce û Bêjen bin
Por gijgijî, dev gerêz
Lêv û zenî bibin mêz

Şermê bavên ber derî
Bibin hov û serserî
Mey ji lêvan binoşin
Vê jînê xweş bidoşin
Şaşê bavêm li ber pê
Ne kiras û ne derpê
Bibim qeşmer, herim, bêm
Bere ezbim ewê kêm
Çavan bigrim herim dûr
Nav gomanên pir û kûr
Herim binê *Boxazê*
Belkî bighêm daxwazê
Di nav pêlên pingavê
Belkî herim peravê
Perdê ji ser xwe rakim
Da bizanî çi pakim
Ey dawera evînê !
Ken şeker û şirînê
Veşartiyên hebûnê
Berçavên peydebûnê
Min rakişîne banî
Bi min bide xuyanî

Seyda, çiye dibêjî ?
Li xwe dikî sergêjî
Ev tewşepirsiyare
Ne nûjene kevnare
Ne Cizîrî, ne Xanî
Kesî bersiv nezanî
Sed wek Feqîyê Teyran
Di vir de mane heyran
Pir dijware ez benî
Ne serî û ne binî
Ne ev şev û ne ev roj
Ne bihişt û nejî doj
Ne destkera kesî ne
Ne wek kûp û misîne
Çi hatin û çijî çûn
Herdem heye ev hebûn
Wer felsefa nû bixwîn
Zanî kîye Ciger-Xwîn ?

## AGIR Û SOHTIN

Agirê derdê te îro
Suhtime wek pir-pirîk
        Awirên wan herdû çavan
        Dil vekirne sed berîk
Sed derî dadan li ber min
Da ku neghêm dilberê
        Qet nikarîbû vekim
        Ez li ber xwe yek derîk
Min di destê gulfiroşan
Dî gulek rûgeş - bi ken
        Mal û can min dan bihayê
        Sorgula geş bê şirîk
Min nizanî ko li hawîr
Wê hene xar û kelem
        Bûye çil sal ko bi wê
        Xarêve ez mayim xerîk
Min dixwest ez bîn bikim
Wê sorgula nazdar û geş
        Lê ji destê min revandî
        Sorgula min ser-serîk
Pîr û kalim ez, nikarim
jê bixwazim wê bi zor
        Min bi lav-lav daye pey wî
        Nadî dest min ew perîk
Min li nêv van şax û deştan
Çandibûn hin: nîsk û nok

Çîqreşan carek li ser
Danîn û xwarin hêj firîk
Navbera herdû çeman
Qada mi bû, lê ez çikim
Dijminê dijwar û serdest
Nadî dest min : Omerîk
Garisê avî me çand û
Serbilind bû, zû giha
Lê ji hawîr ref bi ref
Danîn li ser çûk û çivîk
Garisek bê harisek ez
Dê çi bênim bênderê ?
Koç û kerwan tên di berve
Jêdikin her yek serîk
Min dil û gurçik kirîbûn
Ko ji bo xo bikme şîv
Kûçik û tajî û tola
Tev birin, ma ker-kerîk
Kîliwek nanê genim
Ko min ji nanpêjan kirî
Parsek û kor û kulek
Ew tev revandin, ma kerîk
Ey Cigerxwîn, ka ji vê jînê
Çi zanî ezbenî !?
Şox û şenge, pir çelenge
Nazedar û sur-perîk.

## KA DOSTA ZANA

Divêm dil bi dim dostek zane û jîr
Evîndar û xwedî bawer, xwedî bîr
Gelek rêzan, gelek hozan, bi tedbîr
        Belê çibkim nedî min ew, nedî min...

Çiqas çavên xwe min hawîr gerandin
Piyên xwe min di vê rêde dirandin
Me kincê: sebr û samanan çirandin
        Belê çibkim, nedî min ew, nedî min...

Me: Şaş û cibbe avêtin ji derdan
Me ola xwe, me malê xwe bi derdan
Me can û dil divê rêde li ser dan
        Belê çibkim, nedî min ew, nedî min...

Heye çil sal ku ez hawîr dibazim
Li Şam û hem li Bexda ez digazim
Şev û rojan dinalim dev ji sazim
        Belê çibkim nedî min ew, nedî min...

Li ezmanan di ser hewranve ez çûm
Ji vî bextê minê reş-tarî û şûm
Dikûrim ez li her alî, wekî Bûm
Belê çibkim, nedî min ew, nedî min...

Wekî dêwê sipî girs û dirêjim
Bi van ristan gelek fortan dibêjim
Çi solbendim, belê ez bê dirêjim
Belê çibkim nedî min ew, nedî min...

Ji bona xatirê çavên te yên reş
Ji bo bighêm ewan dêmên te yên geş
Ji bo maçên dev û lêvên te yên xweş
Belê çibkim nedî min ew, nedî min...

Li Kerkûk û li Waşoxan û Amed
Li bermayên: Metîn û Horî û Med
Me go: belkî bibênim ez şirîn-qed
Belê çibkim nedî min ew, nedî min...

Serê min bû sipî, berfa zinara
Ku pîrî hat, ciwanî ma ji para
Bi min payîz gihişt û çû bihara
Belê çibkim nedî min ew, nedî min...

Dixwazim ez, bibênim yarê şêrîn
Wekû Mem ez dinalim tim li ser Zîn
Wekî Mecnûn li ser Leyla Cigerxwîn
Belê çibkim, nedî min ew, nedî min...

## PERÇEKIRINA RISTEKE CIZİRİ

Min dî di bircê dilberek
Padîşeh û mîr û gerek
Min go: were nik min serek
Dilber şikînand şekerek
        Fe qultû: ya rûhî ! meta ?

Pişta xwe da min, rû li hêt
Gur bûn di dilde: ar û pêt
Min go: bibêje, kêngî têt ?
Go: min heta xatir vebêt ?
        Min go: çikim ez ba-heta ?

Biskan tu bes çîn-çîn bike
Miskîn muqabil dîn bike
Seyda tu bes xemgîn bike
Pêşkêşî yek biskên xwe ke
        Milkê "xeten" textê "xeta"

Dil bendê dava zulfekî
Kevtî kemenda ulfekî
Kuştî bi tîr û şilfekî
Xanim were da dil fekî
        Xew nîne gav û sa-eta

Kêşan li dil sed dax û key
Qêrîn û hawar, deng û dey
Têtin ji min wek na û ney
"Hel fî yedilmeftûnî şey" ?
"Ew keyfe esneê ya feta" ?

Zulfên "pet" û şêrî le ban
Jehrîne "şibhet eqreban"
Reşkakin "şibhê" şeban
Lê bisk bi zulfan ra teba
Êrîş birin xal û xeta

Şêrîn lebê, gotin dirê
Key-Xusriwê dêm gewherê
Zulfên siyah xistim ji rê
Lê min ji biskên pir girê
İro tenê girtin du ta

"Nisbet" perî, zîbaye ew
Wek nêrgiza yek-taye ew
Padîşeha xortaye ew
Ya dil ji min sohtaye ew
Xwezka di nêv desta keta !

Ew nazika birca "hemel"
Derket ji bircê dil di gel
Keenneha necmun efel"
"Ya men yera xullî fe-hel"
"Yeşbeh bi şeyin qameta" ?

Mej bexçeya yar "zeyinî"
Bê tirs û pirs sêvek çinî
Min dest bire sêvê, kenî
Wê gote min: ho ezbenî !
"Xwezka xwedî tê derketa" ?

Yar xweş bi lar û lence bû
Zulf sinbil û leb xunce bû
Min dil tijî eşkince bû
Herçî ku bû, ew qence bû
Jehr bî bi min wek şerbeta

Baxê bihişte, rû xeten
Pê xweş dibin min: can û ten
Lew dil dixwazî jê ketin
"Webîma ceneytû cinyeten"
"Elqet eleyye cînayeta"

Seyda û xweş hosta Mela
Cama di dest mesta,Mela
Paşayê hev - rista, Mela
Ev renge rist besta, Mela
Wek: Dicle û Zab û Şeta

Min dil ji derdan bûye mişt
Têre dibazin: tîr û xişt
Seyda Ciger-xwîn bû, te kuşt
Çibkin ji mizgevt û kenişt
Ko em bixwênin van xeta ?

## QÎR Û HEWAR

Ew kesê dil ketye bendê
Guh didî zarê dimin
        Girtiyê dav û kemendê
        Zanî guftarê dimin
Ê evînderî nedibî
Nabî hevkarê dimin
        Ê nedîbî, ew çi zanî
        Qîr û hewarê dimin ?
Agirê dil kirne dojeh
Roj û êvarê dimin.

Dil ji mizgevt û keniştê
Girtiye, çibkim nimêj ?
        Ev evîna min di dilde
        Janeke dûr û dirêj
Ez ji ber jana evînê
Mame sergerdan û gêj
        Mal û can berdane carek
        Lê ne îro, hê ji mêj
Da bizanî, wer bixwîne
Rist û guftarê dimin
        Dostê sade min nedîne
        Ez bi kê bawer bikim ?

Ev cihan pêkve ne doste
Ez bi kêre şer bikim ?
        Ez dil û cerg û hinavan
        Perçe perçe ker bikim

Agirê dil dojehe
Ez nikarim der bikim

Lê kîyê guhdî li:
Qîr û nal û zar-zarê dimin ?

Şoxe ya min dil bi-deste
Kê diye wek wê ciwan ?

Ez xulamê herdû sêvan
Herdû lêvên erxewan

Min di benda wêde hiştin
Bûye çil sal: cerg û can

Bê ku carek ez bibênim
Ev çi rewşe, sed eman !

Kî dikarî hilgirî
Vî bar û serbarê dimin ?

Ger sipîdê derkevî
Carek ji nêv Birca belek

Xweş bi ser dêmande berdî
Herdû biskê reşxelek
Kêngî wê carek li nik min
Rûnî ey çerxa felek ?

Leşkerê xem ez di berve
Rakişênim lek bi lek

Da bi saya sîme çîmê
Guhdî qar-qarê dimin.

**WEŞANÊN ROJA NU**

35